

Berî 15'ê gelawêjê şer germtir dibe

# Li Çiyayê Kato çalakiya mezin



## Gerîlayan "Bayrak Tepesi" vegirt

✓ Hate ragihandin ku gerîlayan êrîsek biriye ser girê ku leş-kerên tirk navê "Bayrak Tepesi (Gira Alê)" lê kiribû, pişti şerekî nîv saetê, gerîlayen ARGK'ê ev gir jî vegirtiye. Di vî şerî de jî 15 leşker hatine kuştin. Dîsa hate gotin ku, gerîlayan di cihê ala tirkan de alên ERNK û ARGK'ê daçikandine, di çalakiye de 4 gerîlayan jiyan xwe jî dest daye, 4 heb jî birîndar bûne.

## Çalakiyên li Başûr

✓ Ne tenê li Bakur, li Başûr jî di navbera hefteyekê de gelek çalakiyên gerîlayen ARGK'ê pêk hatine. Wekî mînak roja 3'ye mehê gerîlayan saet di navbera 6 û 7'an de riya navbera Haci Umran û Çomanê birîne. Sê erebeyên leşkerî yên PDK'ê ku xwestine destkariyê bikin, ketine kemîna gerîlayan û hatine rûxandin. Hate daxuyandin ku, gelek kuşî û birîndarê PDK hene.

R 3

**Hevpeyîn: Ez lawê rojeveke gelêrî me** - Rûpel 8-9

**Şehîd: Mahmûd Guden** - Rûpel 6

**Aborî-Civakî: Li Kurdistanê projeyên biyanan** - Rûpel 4


**Servet Özkan: Di şer de pêşî çand tê binpêkirin** - Rûpel 16

**Mahmut Kılınç: Merheba** rpl.5

**Celalettin Yöyler: Kes bi dada me nepirsit...** rpl.13

**Lerzan Jandîl: Cezayê to panc markî ya!** rpl.11

**Serkan Brûsk: Çar rûmetên neteweyî** rpl.7



SAMİ TAN

**Helwesta rastîn ji  
êrîşen nerewa diyare.  
Ew dixwazin rî li ber  
belavkirina rojnameyê  
bigirin, lewre jî êrîşen  
tund li ser belavkarê  
rojnameyê têne kirin.**

Berî niha bi çend salan dema  
heyeteke biyan dihate serdana me,  
dihat gotin ku çend hejmarén roj-  
nameyê hatine berhevkin? Dema me  
digot, qet nehatine berhevkin, şâşwaz  
dibûn. Pişti wê êdî şiroveyen me yên li  
ser helwesta dewletê zêde baia wan  
nedikîşand.

Lê, me wê demê jî digot, niha hej-  
mara ku tê firotin kêm e, lewre jî dewlet  
hêjayî êrîşen rasterast nabine, li aliyî din  
jî ew naxwazin zimanê kurdî rewa bibe,  
lewre biryara berhevkinê nade. Her  
wiha me digot, heke rewş biguhere, dê  
helwesta dewletê jî biguhere.

Ev dîtina me bi xebata çend mehan bi  
awayekî vekirî hate çespendin. Pişti ku  
encamên erenî hatin bidestxistin, helwesta  
rayedarên dewletêji guherî; Ji sed û  
heft hejmaran şûn de doz hatin vekirin.

Lê helwesta rastîn ji êrîşen nerewa  
diyar e. Di waîe berhevkinê de hinek  
tengasiyên wan hene, lewre ew dixwazin  
rî li ber belavkirina rojnameyê bigirin,  
lewre jî êrîşen tund li ser belavkarê roj-  
nameyê têne kirin. Ji Amedê bigire heta

Stenbolê hevalên me yên ku rojnameyê  
belav dikin, bi awayekî keyfi têne  
binçavkirin, li dûv lêdan û işkenceyeke  
hov, têne berdan.

Bi taybetî hêzên dewletê li Amedê di  
nava çend heitayan de çend caran  
hevalên me yên belavkar hatin girtin û  
işkenceyên xedâr li wan hatin kirin. Di  
cara dawin de cixare di laşê wan de  
vemirandin.

Her wiha belavkarê yê ku li Esenlera  
Stenbolê rojnameyê belav dike, gelek  
caran hate girtin. Pişti ku hevalê me li  
Qereqola Hala Otogarê sê rojan (bêyi ku  
haya me ji bibe) di bin çavan de ma, roja  
şemiyê ji bo piştevaniyê em çend heval  
çün cihê ku lê heval hatibû girtin. Dema  
hêzên dewletê fêm kir ku em li vir in,  
demeke dirêj têkilî hevalên belavkar  
nebûn, lê piştre polisekî xwest ku  
hevalên belavkar (ên Azadiya Welat û Ü.  
Gündem) bigire. Li ser vê yekê dema  
me dor li polis girt û jê, sedema vê hel-  
westa wî pîrsî, şeqizî, nezanî ci bike.  
Gelek mirov li dor wî kom bûbûn. Pêş  
xwest ku ew belav bibin, lê piraniya

kesen ku kom bûbûn mirovên welatparêz  
bûn, kes belav nebû, lewre wî dev ji me  
berda û çû.

Pişti demekê hate cem me gazi  
xwediyê rojnameyê kir, du heval çûn  
qereqolê. Gava ku dît birvara belavkirinê  
nîn e, got: "Hün li ku belav dikin bikin,  
lê li vir belav nekin." Hevalan jî da zanîn  
ku ew helwesta wî keyfi ye, lewre jî ew  
dê guh nedin wî.

Xuya ye ku ew helwesta keyfi dê  
bidome. Lê ev bûyer bi serê xwe jî nîşan  
dide ku hêzên dewletê dî vê doza xwe  
ya neheq de, dê tu car nikarin bi ser  
bi Kevin.

Der barê rojnameyê de em dixwazin  
du nûçeyan bidin we, yek tiştekî bi xêr e;  
Endamê PKDW'ê Mahmut Kılınç dê ji 15  
rojan carekê di rojnameyê de binivîse.  
Em jê re dibejin: Tu bi xêr hatî!

Nûçeya duymen bêxîr e, ji ber  
egerên diyar buhayê rojnameyê zêde bû.  
Ji vê hefteyê pê ve divê hûn pêncî hezarî  
zêde bidin. Em hêvidar in hûn dê li me  
negirin.

# Nameyek ji Zîlanê re

SADIK ASLAN / GEBZE

Merheba simbola azadiyê! Di ser  
çalakiya te re du sal derbas  
bûn. Lê ev herdu sal bê te der-  
bas nebûn. Di her rojê de navê te hebû.  
Lewre dost jî dijmin jî xwe li gora te saz  
kir.

Belê, iro 30' ê pûşperê ye. Kêliyeke  
din Romên Reş ji bo ayîneke xerab, wê  
werine cem hev. Lê ewrên li ser Welatê  
Rojê vê rewş napejîrinin û di ke-  
lagerma demsalâde, wê "birûske-  
ke havîne" bişînin nav civîna ma-  
rên reş. Qîrîn û hawar wê li nav  
hev bi Kevin û ji ezmanan parçeyên  
laşan wê bîbarin. Te digot "Em  
naxwazin bikujin û werin kuştîn"  
lê ma çi, yên ku dilê wan bi evîna  
mirovahîyê miş e, dê bi rastiya vî  
şerî bigihêjin!

Hemû kes matmayî mam, wê  
rojê mîrxasa mezin. Tişten li ser  
xwezayê hemû di cihê xwe de se-  
kinîn û nelebitîn. Çem hew herikîn, çivîk  
hew firîn û hemû tiştan li ber vê mîrxasi-  
ya te rêz girtin. Hemû kes şas bûn; hinek  
serbilind bûn, hinek ketin nav şermî û hi-  
nekan jî xwe kişandin pîrsiyariyê. Ji bo  
van yekan navê vê rojê pişti te, bû xwîn,  
bû dîrok, bû ked, bû serkeftin, bû evîna  
welêt, bû rûmet û bû namûs...

Li dijî mîrxasiyeye wiha mexlûqen  
weki heywanan ketine nav panîkeke me-  
zin û ji bo vê jî di TV'yan de iftîra avêtîn.  
Yanî dawî hatina xwe anîn ser zimên. Pir  
tîrsiyabûn û ji wê demê pê de her gav wê  
bitîrsiyana. Lewre, devera ku digotin em  
jê ewle ne, di wê deverê de bombeyeke bi  
can teqiyabû.

Xwezi te Dersim bidîta, êdî hevala Zî-  
lan, kêfxweşî û coşke mezin xwe danîbû  
ser rûyê wê û rabûbû ser piyan Dersim.  
Lewre ew ne şerê saetekê bû, ne şerê ro-  
jekê bû; şerê sedsalan bû û bi serkeftînê  
dawî lê hatibû. Qada Cumhuriyetê di nav  
deqîqeyekê de bûbû şahîd şerekî sedsa-  
lan. Tola Seyîd Riza, tola Elîşêr hatibû  
hildan. Besê wê rojê hatibû Dersimê, Be-  
sê ya Hemdem serkeftin ya te bû, ya Be-  
sê ya Hemdem bû. Hevala Zîlan, em he-

**Pişti te her zaroka ku nû çêdibe,  
navê wê Zîlan e êdî. Tu bûyî  
bombeyeke bi can û şervanên  
kurd jî niha bûne bombeya îde-  
olojîk, polîfîk û rîkxistîniyê. Lew-  
re, wateya livbaziya te jî ev bû.**

mû zanîn êdî bê girêdahiya bi Serokatiyê  
re çawa çêdibe. Lewre, girêdahiya te gi-  
redahiyeke pîroz bû û te ev bi livbaziye-  
ke esil nîşan da. Yanî, bes mirov dikare  
bi livbaziye di tevgera Serok bigîheje. Ji  
bo vê Serok jî helwesta te geleki têkûz  
anî ser zimên û tu weki semboleke ser û  
azadiyê danî pêsiya me. Ji bo te got ku:  
"Fermandar Zîlan e, em hemû leşkerê wê  
ne." Belê qumandana me, tu ji bo me  
xudewan (tanrıça) e, xudewana şer e.  
Yezdanî an jî xudewanî karê afirandinê  
ye û yên ku afirandinê bi şer pêk tîne jê  
re dibejin yezdanê şer an jî xudewana şer.  
Ji bo me jî mezintirîn xudewan ya şer e.  
Tu zanîbî ku pişti te gelek tiş hatin gu-

artin. Her roja me, her gava me hêdî hê-  
dî ber bi serxwebûnê û serkeftînê ve dije!  
Jina kurdan a binketî ku te bi livbaziya  
xwe ji binî ve ji holê rakir, êdî li ser lin-  
gê xwe ye û bêhtir bi quwet e. Hêrsa te  
êdî bûye hêrsa hemû jinê kurd. Bombe-  
ya ku pêşî te teqand, nasekine êdî. Di bin  
pêşengiya te de Rewşen û Bermal bûn  
bombe û xwe teqandin. Hêrsa wan jî we-  
ki ya te bû. Hêrsa mezin berpirsiyariyeye  
mezin datîne pêsiya mirov, ji bo vê jî wan

pêwiştiya vê berpirsiyariyeye anîn  
cih û li ser şopa te hatin. Ne bi vê  
tenê ma, jîna ku di riya te de bû,  
derseke mezin da ixanetê, wekî  
ku di dîrokê de her tim ixanet ji  
me qut nebûbû, pişti te jî rû da.  
Êdî li ber mirovan du xet hebûn.  
Yanî "Du Z". Yek xeta te ya  
berxwedanê, yek jî xeta rûreşê  
Zekî ya ixanetê. Lê Hevala Sema  
û Hevalê Fikri di şopa te de, bî  
agirê xwe ixanet tev de şewitan-  
din. Em zanîn bê te çiqas hez ji  
zarokan dikir. Belê wekî ku gelê me he-  
mû tev de rabûye ser piyan, zarokên kur-  
dan jî bûne generalê biçuk û di ser panzê-  
ran de dimeşin. Pişti te her zaroka ku nû  
çêdibe, navê wê Zîlan e, êdî û zarok jî wi-  
ha bersivê didine hezkirina te ya li wan.  
Şervanên li serê çiyan jî bi quweta ku ji te  
standine, li dijî sedhezaran leşkerê tirk,  
berxwedaneke mezin pêk tînîn. Tu bûyî  
bombeyeke bi can, lê şervanên kurd niha  
bûne bombeya îdeolojîk, polîfîk û rîkxis-  
tîniyê. Lewre, daxwaziya te jî ev bû û  
wateya livbaziya te jî ev bû.

Silav ji te re ser leşkera mezin, silav ji  
te re manîfestoya jiyana azad. Em her tim  
li ser şopa te ne.

## Ferhengok

- ajewaperestî:** anar-  
sîzm
- amûr:** navgîn, hacet
- avasazî:** mîmârî
- awat:** hêvî
- bengî:** tutkun
- bijûnî:** adanî (verimli-  
lik)
- bikérânîn:** işlemek
- binê zemanan:** axir  
zeman
- bîskurî:** zarokên jêha-  
ti
- çak:** baş, qenc, çê
- çelikirîn:** behskirin
- darişîn:** afirandin (tü-  
retmek)
- deman:** kirê; icra
- dozandin:** dîtin
- êgin:** mirovê jêhatî
- fenanî:** wekî, mina
- gîzre:** tişte ne hişk û  
ne ter
- hest:** dilîn, hîs
- heyandin:** bikérkirin  
(işlemek)
- heyn:** demen xweş
- hêjandin:** nirxandin
- hêma:** nîma (ime)
- karwanî:** pratik
- lajwerd:** maden
- lajçûn:** mesref

- ligeî:** digel, tevî
- lüwan:** koridor
- masat:** haceta sûtina  
tirpanê
- mezaxtin:** harcamak
- nêşet:** nîşane
- nîsilîn:** süzülme
- nor:** dijber (karşıt)
- orxe:** hespê meşxwes
- paxav:** xem, metris
- pêpelük:** qonax (aşa-  
ma)
- pêşangeh:** sergi
- pêşnûma:** tasarı
- ramyari:** siyasi
- rasterê:** rasterast
- rewa:** meşrû
- rehsinandin:** terikan-  
din
- tay:** teng
- şanstêr:** komika stê-  
ran
- şeqizîn:** tengezar bûn
- şenber:** berbiçav
- veguhestin:** neqîlkirin  
(ulaşım)
- zehmedarî:** xwarinên  
bi rûn
- zêrobom:** avhewa, ik-  
lim

Azadiya Welat

# *Berî 15'ê gelawêjê şer germtir dibe*

## **Li Çiyayê Kato çalakiya mezin**

Bi nêzîkbûna 15'ê gelawêjê re çalakiyên gerîlayên ARGK'ê li Başûr û Bakur zêde bûn. Di çalakiyên hefteyekê de bi dehan leşker, tîmên taybet, cerdevan û PDK'yî hatine kuştin, gelek jî birîdar bûne. Çalakiya herî mezîn roja 2'ye gelawêjê li herêma Çiyayê Kato û Deriyê Kaç pêk hat, di vê çalakiyê de 40 leşker hatine kuştin.

**B**i nêzîkbûna 15'ê Gelawêjê re şerê li Kurdistanê gurtir bû. Ji Der-simê heta Şîrnexê, ji Amedê he-ta qeraxa Behra Reş li gelek cihan çalakiyên gerilayen pêk tê. Ev çalakî der-beyeke xedar li şerê psîkolojîk ên dewleta tirk dixin. Êdî nûçeyên şer di çape-meniya tirk de jî bi berfirehî cih digirin. Her wiha hin kes bêbaweriya xwe li ser gotinêñ fermandarêñ artêşa tirk diyar di-kin. Di şerê li Çiyayê Kato û Deriyê Kaç de, bi pey çavkaniyêñ ARGK'ê 40 leş-ker hatine kuştin lê bi pey çavkaniyêñ dewleta Tirkîyeyê, ew hejmar wekî 15 leşkeran diyar bû. ARGK'ê navê “Ope-rasyona Şoresser a Şehîd Hemze” li vê çalakiyê kir. Bi pey agahiyêñ ku bi dest ketine, hêzên gerfla seva 2'yê gelawêjê, ji sê aliyan ve êriş birine ser 6 tofêñ (bö-lük) artêşa tirk. Li vir şer 3 saetan kişan-diye, li ser Girê Doçka du heb jê subay cendekê 20 leşkeran hatine ditin, li ser Girê Bikom jî cendekê 5 leşkeran hatiye ditin.

**Gerilayan "Bayrak Tepesi" vegirt**

Li aliye din hate ragihandin gerîlayan  
êrîsek ji biriye ser girê ku leşkerên tirk  
navê "Bayrak Tepesi (Gira Alê)" lê kiri-  
bû, piştî şerekî nîv saetê, gerîlayen  
ARGK'ê ev gir ji vegirtiye. Di vî şerî de  
ji 15 leşker hatine kuştin. Dîsa hate go-  
tin ku, gerîlayan di cihê ala tirkan de  
alên ERNK û ARGK'ê daçikandine. Li  
gorî çavkaniyên ARGK'ê, di çalakiyê  
de 4 gerîlayan jiyana xwe ji dest daye, 4  
heb ji birîndar bûne. Ev hejmar, ji hêla  
ajansên dewleta Tirkîyeyê ve hate sel-  
mandin. Çavkaniyên ARGK'ê navê 9  
leşkeran ji dan. Bi pey heman çavkani-  
yan, gerîlayan gelek amûrên şer desteser  
kirine, hindek ji wan ji ber ku neguhez-  
bar (taşnilimaz) bûne, hatine rûxandin.  
Di nav tiştên ku hatine desteserkirin de,  
aleke tirkan ji hebûye. Her wiha hate da-  
xuyandin ku, gerîlayen ARGK'ê di he-  
man katê de êrîş birine ser Qereqola Ele-  
na û li wê derê ji qereqol bi çekên gîran  
hatiye rûxandin, lê diyar nebûye ku ji  
hêzên arteşa Tirkîyeyê cend heb kuştî û  
birîndar hene.

Li dûv vê çalakiyê, hêzên dewletê bi  
sê tîpan (tugay) leşker kişandin herêmê  
û operasyon dane destpêkirin. Li hem-  
berî vê operasyonê, hêzên ARGK'ê ji  
çalakiyan pêk tînin. Tê ragihandin ku,  
piştî vê çalakiyê Nexweşxaneya Şîrnexê  
ji kesên sivîl re hatiye girtin.

Ji bili vê çalakiyê di nava hefteyekê de li gelek cihêن Bakur û Başûr çalakî pêk hatin. Bo nimûne, gerîlayên ARKG'ê roja 2'yê gelawêjê li ser riya di



navbera Dêrsim û Pulurê (Ovacık) de  
kemînek danîne ber hêzên dewletê, di vê  
çalakiyê de assubayek, çawişekî pispor  
û 4 leşker hatine kuştin, serhengek, tî-  
mekî taybet û gelek leşker jî birîndar bû-  
ne. Li gorî daxuniyan, ARGK'ê ev çala-  
kî ji bo tolhildana du gerîlayan, ku roja  
26'ê tîrmehê bi destê hêzên dewletê ha-  
tin kustin, pêk anîye.

Her wiha heman rojê gerîlayan riya  
di navbera Dêrsim û Elezîzê li nêzî Pirâ  
Dînarê birîne û êrişike tund birine ser  
zerîpoşeke tîmêñ taybet. Di vê çalakiyê  
de 3 tîmêñ taybet hatine kustin.

Li gelyê Kirdranûsa Culemêrgê gerî-  
layan mayin li girekî ku leşkeran lê no-  
bet digirtiye, bi cih kiriye. Mayin roja  
2'yê gelawêjê saet li dora 5.30 teqiyaye,  
di encama teqînê de gelek leşker mirine,  
gelek jî birîndar bûne.

Li Xweşnava Wanê roja 1'ê gelawê-jê komeke gerîlayan avêtiye ser gundê Şeftanê, ku tê de 12 cerdevan hebûye. Ji wan 12 cerdevanan 9 heb dîl hatine git-tin. Her wiha gerîlayan şeniyê gundê, ku ji 40 malî pêk dihatiye, li hev civandine û ji wan re sistema cerdevaniyê şirove kirine. Li ser daxwaza gundiyan, ji bo carekê cerdevanê dîl serbest hatine ber-dan. Lê gerîlayan dest danîne ser 9 ke-leşnikofan û hinek amûrên ser.

Dîsa li Erziromê sevâ 3'ya gelawêjê gerîlayan avêtine ser gundê cerdevanan ê bi navê Ağaç, di êrîşa ku ji nişka ve pêk hatiye de, cerdevanan bersiv daye, şerê demeke kurt dom kiriye. Lê li ser xesarên cerdevanan agahî bi destê çav-kaniyêñ ARGK neketine. Lê hêzên dew-letê ku hatine hawara cerdevanan, ketine kemîna gerîlayan, erebeyeke leşkerî li mayîna gerîlayan qelibîye û erebeya li

pey wê jî li wê erebeya pêşîn qelibiyê û piştre jî di zinêr wer bûye. Der barê zayıyatêن hêzên dewletê de agahiyêن sere-rast bi dest neketinê.

Li Dêrika Mêrdînê jî gerflayan aveti-  
ne ser gundê Zorova ku tê de cerdeva-  
nên ji eşîra Metîna nîstecih in, di vê êri-  
şê de du cerdevan bi xedârî birîndar bû-  
ne. Hêzên ARGK'ê li ser riya di navbe-  
ra Midyad û Nisêbînê de jî êrişek birine  
ser hêzên dewletê, li ser encamên vê çalakîyê agahiyê sererast bi dest neketi-  
ne.

Li hemberî hêzên dewletê yênu ku derketine operasyonê, roja 2'ye gelawêjê li pesara di navbera Mûş û Qulpê de êrîşekê gerîla pêk hatiye. Şerê ku piştî vê êrîşê derketiye, bi qasî saetekê dom kiriye. Di vî şerî de 2 leşker hatine kuştin, 3 leşker jî birîndar bûne.

Gerîlayê ARGK'ê li gelek cihan ji  
rê birîne û erebe dane sekinandin, piştî  
raçavkirina nasnameyên rîwiyan, ji wan  
re propoganda kirine.

Roja 2'ê gelawêjê saet di 14.00'an de gerîla riya di navbera Pertag û Xozatê de birfîne û nasnameyên rîwiya raçavkirine. Gerîlayên ARGK'ê sêniya gund li hev civandina û ji wan re propoganda kirine, piştre jî rê dane wan. Li herêma Aşsekera Pertagê kepçe û kamyoneke kesên ku li xezîneyê digerîyane, ji hêla gerîlayan ve hatiye şewitandin.

Her wiha gerilayên ARGK'ê riya di navbera Çewlik û Elezîzê de rê birfîne û nasnameya rîwiyan kontrol kirine. Di vê bûyerê de sê wesayitên Belediyea Çewlikê hatine şewitandin.

ra hefteyekê de gelek çalakiyên gerîla-  
yên ARGK'ê pêk hatine.

Wekî mînak roja 3' yê mehê gerîlayan  
saet di navbera 6 û 7'an de riya navbera  
Haci Umran û Çomanê birîne. Sê erebe-  
yên leskeferî yên PDK'ê ku xwestine dest-  
kariyê bikin, ketîne kemîna gerîlayan û  
hatîne rûxandin. Hate daxuyandin ku,  
gelek kuşti û birîndarê PDK hene, lê  
agahîvîn tegez bi dest neketine.

Dîsa hate ragihandin kontrolên hêzên ARGK'ê yên li derdora Sîdeka û Bîradost jî zêde bûne. Di kontrolan de gerîlayan roja 2'ye gelawêjê dest danîne ser 7 erebeyên PDK'ê. Her wiha 9 keleş, 1 B-7, 1 Arbîkî, dûrbînek û gelek cebil-xane hatine desteserkirin, gerîlayan hin kesên gumanbar jî girtine. Li deşta Herke 10 PDK'yiyan tevî 6 keleş, bîksiyekê xwe spartine hêzên ARGK'ê.

Roja 3'ye mehê serê sibê hêzên gerîla avêtîne ser deriyê gumrikê yê Haci Umranê û hêzên PDK'ê ji wir reviyane. Li ser vê yekê gerîlayê ARKG'ê erebe-yeke li wir rûxandine û ji wir veqetiya-ne. Li Deşta û Hertê gerîlayan mayinênu ku ji dûr ve têñ teqandin, di çeperê PDK'ê de teqandine. Di vê bûyerê de fermandarekî PDK hatiye kuştin, 3 heb PDK'yî ji birîndar bûne. Li Sîdeka şantiyea hêzên PDK'ê büye hedefa cerda gerîlayan. Li gorî agahîyan piştî ku hêzên PDK ji şantiyeyê reviyane, gerîlayan 2 dozer şewitandine. Gerîlayan li gund légerîn pêk anîne, di vê légerînê de 4 heb PDK'yiyê çekdar xwe radestî gerîlayê ARKG'ê kiriye. Gerîlayan çekêne wan desteser kirine û peyre ji ew serhest berdane.

Çalaklıyən li Başûr

Ne tenê li Bakur, li Başûr jî di navbe-

# Li Kurdistanê projeyên biyanan

Almanan rîhesin tercîh dikir. Ji bo beşa riya Berlîn-Bexdayê ya ku di Kurdistanê re dibihure berpirsê herî bilind, Împarator Wîlhelmê 2'ye mîn kete dewreyê. Ji bilî girîngiya wê ya stratejîk, ji bo bidestxistina daringa xav ên Kurdistanê û wekî cihê bazarê bikaranîna herêmê riya hesin gelekî girîng bû.

**L**avîn volkanîk ên ku ji bilindahiyêن çiyayên Kurdistanê ber bi xwarê ve herikine, kortal û qeliştek pêk anîne, bi tijîbûna van kurtal û qeliştekan deşten bijûn pêk hatine. Ev deşten li quntara çiyayan, bingeha kîşweren (îqlim) mîroklima peyde kirine. Platojen bilind, mîrg û zozan û wekî tiştekî tamamkar çem û robarêñ zêde, nîşaneyê dewlemen-diyyen jérzemîna wî welati ne. Her wekî tê zanîn, kanên dewlemend ên madenan disa li heman welati ne. Hesin, krom, neft, gaza xwezayî û sıfır (paxir) û destxistina cu-reyên din ên madenê û bikêrkirina wan di pîsesaziyê de, dewlemendiya kanên made-nê binerdi nîşan didin.

Pir-cureyî û dewlemendî bi tenê di kanaan de tuneye, her wiha di haceten hilberînê û di hêzên hilberînê yên ku ku wan haceten bi kar tînin de ji ew pir-cureyî û dewlemendî balê dikişine. Pir-dengiya et-nîk, olî û mezhebi, nakokiyêñ çinayetî û şeweyêñ hilberînê yên ku li gorî wê pir-curetiyê teşe girtine gelek in.

**Projeyen ku bi destê dewletêne împeryalist hatine amadekirin û asta pêkhatina wan**

## A-Dewlemendiyêñ binerdi û neft

Ber bi dawîya sedsala 19'an, pişti ku neft bi awayekî berfirîh di pîsesaziyê (endüstri) de hate bikaranîn, nefta Rojhilata Navîn gelekî bala dewleten împeryalist kîsand. Pisporêñ ku di bin navê arkeologiyê de xebat dikirin, li Kerkükê ka-nên dewlemend ên neftê dozand. Li gorî pêşbîniyan, kapasiteya nefta Kerkükê ji ya Bakûyê deh carî zêdetir bû. Şirketêneftê ji bo ku mafê bikaranîna nefta wê herêmê bi dest bixin, ketin pêşbirkê û keft û leften ji bo wê mebestê, ku bi destê dewletan dihatin meşandin, gelekî gur bûn. Bi taybetî dewleta Almanyayê ku xwediyyê hîviyê mezin bû û Ingîlistana ku dixwest serweriya herêma ji Rojhilata Navîn heta Asyayê bi dest bixe, ketibûn pêşbirkeke bêaman. Dewleten Yekbûyî ji di vî warî de rasterast dest diavêt projeyan û bi kar-waniyê dest bi xebatê dikir. Dîsa di navbe-ra Fransaya ku pişti Şerî Yekemîn ê Cîhanê dest avêt herêmê û Ingîlistanê de ji neft bû mijara pêşbirkê.

Dewleta Osmanî ku bi potansiyela nef-tê hesiya, dema haydar bû ku, dê bi tena serê xwe nikaribe neftê kontrol bike, li gorî berjewendiyen xwe, li pey danîna pê-wendiyen geriya.

Ji bilî neftê, di serî de hesin, sıfır û krom, gelek jêderkîn lajwerdê yên zengin hene. Welatên împeryalist ev ji di plan û pêşnûmeyen xwe de hewandin û bi me-bestâ bikaranîna wan dest bi xebatan kirin. Lî, di pêşbirkê de giranbûna neftê, lajwer-den din di asteke nizm de hişt.

## B-Ferat-Dîjle û Çandînî

Ger hilberîneke bi rek û pêk bîhata ki-rin, gengaz bû ku li Mezopotamyayê hil-berîna pembo û dexil derketa asteke bi-lind. Bi boçuna almanan pêkan bû ku pemboyê Mezopotamyayê li gorî yê Çukurovayê bi lêçûneke hindiktir bîhata hil-berandin û her wiha pemboyekî xweşiktir û pirtir bîhata bidestxistin. Hilberîna dexil

sedema baş- hêjandina berhemên herêmê. Jixwe berê li Mezopotamyayê veguhestina li ser çeman hebû û wê yekê rewş hêşantir kiribû. Pişti ku Brîtaniyan imtiyaz bi dest xist, besdarbûna sermayeya Almanan ji hate rojevê.

## C-Ramîriyên Veguhestinê



Bijûniya erdê Kurdistanê û pirbûna avê nîşana dewlemendiya vî welati ye.

jî dikaribû derketa asteke bilind.

Brîtaniyan berî wê, bo bikêranîna berhemên çandînî, xebatin dane destpêkirin. Ji çemîn Ferat û Dîjle projeyen bo pêkanîna avdan û veguhestinê ketin jiyanê. Ji bo veguhestina berhemên çandînî û pêkhatina bazirganiyê gav hatin avêtin. Lewre di veguhestinê de bikaranîna çeman, dê bibûya

Brîtanî ligel ku bo bazirganiya ku digel Hindistanê û welatên din ên Rojhilatê Dûr dikir, li pey riyan kurt bû. Her wiha ji bo bidestxistina zengîniyê herêmê di hewldanê de bû. Bi wê mebestê, karê veguhes-tina tiştan a li ser çemî ku di ser Trabzonê re û bi riya Feratê dihate fikirîn, di heman demê de dê bûbuya warê qezanca aborî.

Brîtaniyan ji bo wê pir hewl dan.

Berevajî wê, almanan rîhesin tercîh dikir. Ji bo beşa riya Berlîn-Bexdayê ya ku di Kurdistanê re dibihure, berpirsê heri payeberz, Împarator Wîlhelmê 2'ye mîn kete dewreyê. Ji bilî girîngiya wê ya stratejîk, ji bo bidestxistina daringa xav (heyberen kartenekirî) bikêranîna sererd û bi-nerden zengin ên Kurdistanê û wekî cihê bazarê bikaranîna herêmê riya hesin gele-kî girîng bû.

## D-Projeya Chester

Projeya Chester ji bo ketina li Kurdistanê ji aliye DYAYê ve hatiye amadekirin. Ev proje ne bi tenê bi armanca aborî her wiha bi armanca ramyarî ji hatiye sazikirin. Projeya ku bi astenga almanan pêşiyê derfeta jiyanê nedît, bi xurtbûna Kemalîstan re careke din hate rojevê. Di 1922'yan de Enqereyê ev imtiyaz danê. Li gorî imtiyazên ku bo 99 salan hatine dayin, Musil ji di nav de hema bîbêje hemû deveren neftê yên Kurdistanê dê bihatana bikaranîn. Şirketê dê li cihêñ ku li her du aliye riya hesin dikevin ku berahiya her aî 20 km'ye, ligel neftê, lajwerd ji bo bikêra-nîne bidana xebitandin.

Lê ji ber ku Musil û Kerkük di bin des-te Ingîlîsan de bû, DYAYê derfeta jiyan-dina projeyê nedît.

## E-Li Bakur împeryalîzma ûris

Ûrisen ku di ser Kurdistanê re xewne-rojka destkariya Rojhilata Navîn û Derya-ya Spî di bir û hizrên xwe de dihewandin, di warê aborî de girîngiyeke mezin dane Qersê. Rûsyaya ku bi riya hesin Qers bi Tiflisê ve girêda, dixwest ku ber bi Erzîrom, Erzingan, Wanê biçe û ji wir wê de jî dixwest dakeve Başûr. Her wiha li ser Kurdistana Sor ji serdest bû.

Li Qersê hilberîna dexil, fêkî û beqla-behtir zêde kir. Firehbûna çandina guleba-xanan digel xwe pirbûna rûnê ron anî. Her wiha di encama çandina titûnê de, karge-hen biçük ên cixareyê hatin sazkirin. Bikaranîna teknikên cur bi cur ên çandiniyê hilberîna ceh û genim zêdetir kir. Dîsa çandina gîlîl, kartol û birinc bi lez û bez bû. Bo nimûne, di 1863'an de 794 ton kartol hatin bidestxistin lê ev hejmar di sala 1910'an de derkete 4416 tonî. Bi wê hilberîne re, di çandiniyê de kapitalizmê rû di-da. Dîsa bi başkirina cisnê sewalan re hejmar û kalîteya wan zêde bû. Her wiha mi-rovan bêhtir ji berhemên sewalan sîd wergirt. Mandira hatin sazkirin, bikêranîna çerm bi pêş ve çû. Berhemên ku dihatin hilberandin, bi riya hesin diçûn Tiflisê û ji wir jî hetanî navenda Rûsyayê diçûn.

Ûrisan di pêvajoya ku li Qersê man de, di warê avasaziyê de jî tiştin girîng pêk anîn. Dîsa şenîyê Qersê pir kozmopolit bû. Ligel kurd, ermen û tîrkan; ûris, polonî, estonî û yewnanî hebûn.

AHMET KAYA (ABORIZAN)

# Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

**Pêşgir**

Di kurmancî de lêker ne tenê bi alîkariya paşgiran, belkî ji wê zêdetir bi alîkariya pêşgiran têni dariştin. Hinek qertaf têne ber lêkeran û wateyeke nû li wê lêkerê bar dikin, ango lêkereke nû pêk tînin. Bo nimûme dema mirov dibêje "kirin" tiştek tê bîra mirov, lê dema "rakirin" hate gotin tiştekî din tê bîra mirov. Li vir qertafê /ra-/ pêşgir (pêrkît, xurdepêş) e. Pêşgirên lêker çêker ku bi berfirehî têni bikaranîn "wer, da, ra, ve, hil" in. Mirov dikare ji wan pêşgiran çend mînakan bide.

**Wer-**

Ji gerîn wergerîn  
 Ji gerandin wergerandin  
 Ji girtin wergirtin  
 Ji kirin werkirin  
 Ji dan werdan  
 Ji pêçanê werpêçan  
**Da-**  
 Ji dan dadan  
 Ji ketin daketin

Ji gerîn dagerînJi xistin daxistinJi girtin dagirtin**Ra-**Ji kirin rakirinJi borîn raborînJi bûn rabûnJi xistin raxistinJi hiştin rahiştinJi hejandin rahejandinJi gihandin ragihandinJi perîn raperîn**Ve-**Ji dan vedanJi bûn yebûnJi kirin yekirinJi girtin vegirtinJi niştin yenîştinJi mirandin yemirandinJi listin yelistinJi hatin vehatinJi gotin vegotinJi kuştin vekuştin

Wekî têbiniyekê mirov dikare li ser pêşgirên "ve-" çend tiştan bibêje. Di devoka behdînan de ev pêşgir dibe "eve" û bi dawiya lêkeran ve dibe wekî xwarineve (vexwarin), di zaravayê sooranî de jî ew pêşgir dibe "ewe" û bi dawiya lêkeran ve dibe ango dibe paşgir wekî xwardinewe (vexwarin), kirdinewe (vekirin), di zaravayê kirmancî de wekî kurmancî ye, hin caran tê dawiya hevokê wekî wekerdin (vêxistin), weriştin (rabûn). Di hin devokan de dibe "Mi adir kerd we".

**Hil-**Ji kirin hilkirinJi bûn hilbûnJi anîn hilanînJi bijartin hilbijartinJi pekin hilpekinJi weşandin hilweşandinJi hatin hilhatinJi girtin hilgirtinJi ketin hilketin

Ji bilî van pêşgiran du pêşgirên din hene ku zêde nayêni bikaranîn. Ew jî /ro-/ û /çê-/ ne. Ew pêşgir bi tenê di çend mînakan de derdi kevin pêşberî mirov wekî

Ji kirin rokirinJi niştin rûniştinJi kirin çêkirinJi bûn çêbûn

Divê wekî nişeyekê mirov li ser xaleke din jî raweste. Ev lêker gava qertafeke din bigirin, ev qertaf dikevin navbera lêkerên bingehîn û pêşgirê. Her çiqas di hin devokan de bi awayê din jî tê bilîvîkirin, lê di zimanê nivîskî de mirov nikare bibêje "dirabim" divê mirov bibêje radibim. Li vê derê qertafê /di-/ dikeve navbera pêşgir û lêkera bingehîn. Qertafen din jî li gorî heman rîpîvanê têne bikaranîn. Bo nimûme qertafê neyinîy /ne-/. Her wiha di lêkerên wiha de qertafa raweya fermanî /bi-/ zêde nayêni bikaranîn, lê heke bê bikaranîn jî divê li gorî vê rîpîvanê tê xebitandin. Ji bo zelalkirina mijarê çend mînak


Eli derî venekir.Zinê agir vedimirand.Bila derî venebe.

Çalekê ve(bi)de.

Ji min re çê(bi)ke.

Roj hilnehat.**Merheba**

MAHMUT KILINÇ



Merheba xwendevanê hêja û bi rûmet!. Heger ku tu bêxêrî nebin, iro pê de her panzdeh rojan yanê di hejmarekê ne di ya din de ezê ji bo we binivîsim.

Bi rastî demeke dirêj e ku min dixwest ji bo rojnameya me kurdan Azadiya Welat binivîsim; lê belê ji bo min asteng hebûn, derfetan dest nedida. Kêmanîyeke min jî hebû, divê ez jî xwe eşkere bikim; di jiyanâ xwe de heta salekî berî niha min bi zimanê xwe yanî bi kurdî nenivîsbû. Di axaftina min de jî gelek kêmanî û asteng hebûn. Mixabin berî ez li ser wan kêmasiyên xwe nesekinîbû; ji bo sererastkirina wan min xebat nekiribû. Lê van salêن dawîn min da xwe û ew astengên min, heger bi temamî ji navê ranebûbin jî, gelekî kêm bûne.

Jixwe kêmâniyên zimanê berê ew qas ne balkêş bûn jî. Dema ku weşanêni bi kurdî dest pê kir, zêde û fireh bûn, hem ji bo kesan û hem ji bi civakî ew kêmanî derketin pêş. Ji bo vê rastiyê, heger di nivîsen min de hinek xeletî û kêmâsi hebin bibexşînin.

Divê mirov bixwîne û binivîse.

Gelek caran kesen bi rûmet, li ser pêwîstiya bikaranîna zîmân sekinîne, ez nexwazim dubare bikim. Jixwe ez ne pispor im jî. Lê rastiyek heye, divê ez bi bîr bînim; di pêvajoya têkoşîna neteweyî de ziman bêşik gelekî girîng e. Ne ji bo gelê kurd bi tenê, ji bo hemû neteweyan, gel û civakan ew rastî serdest e. Hele ew gel bindest bin, welatê wan hatibe dagirkirin û dagirkir bi her awayî politikayê asîmîlasyonê li ser wan bimeşînin, pêwîstiya zîmân û nîrxêneteweyî hêjî zêdetir dibe.

Tu netewe ne bêziman in; neteweyen ku dixwazin mafê çarenûsê bigirin destê xwe, berî her tişti divê zimanê xwe ji bin bandora dagirkiran derxînin. Rojnameya Azadiya Welat di vî warê girîng de wezîfeyeke gelek bi rûmet û şeref pêk tîne. Her wiha hemû weşanêni bi kurdî layiqî vê kîrinê ne. Hele şoreşa bi rûmet ku bi MED-TV'ye dest pê kiriye, di dîroka kurdan de wê di pelkeke zêrîne de cihê xwe bigire.

Lakin bi aliyekev e weşana ku di bin hezar êrîş û zextêni dagirkiran de tê holê, bi aliye din ve ji bo ku gelek kêm têne firotin û xwendin, di qada navneteweyî de propagandayeke dijminî bi destê dewleta tîr têye meşandin. Dardorêni biyan jî li ser vê propagandayê lomeyan li me dikin. Bo mînak hinek siyasetmedarên Ewrûpayê ji me dipirsin: "Rojnameyek heye bi kurdî weşanê dike, gelo ew çiqas difiroş?" Heta carinan ji bo MED-TV'ye jî dibêjin, "Bi texmînî çiqas mirov lê temaşe dikin?" Li ser agahiyê çewt ku dewleta tîr belav dike, ev pirs têne kîrin.

Xwendina rojnameyên bi kurdî, temâsekirina li MED-TV'ye, heta xwendina rojnameyên kurdan ên ku bi tîrkî weşanê dikin, piştevaniya ji bo HADEP'ê, piştgirîya ji bo komeleyên Kurdistanê û hwd. Ji bo van mijaran heger di nava civakê de bi giştî bi hev re hewldan nebin; qey mirov dikane bibêje ku li dijî dewleta dagirkir bes deng derdi keve? Ew hewldan, nêşetên netewebûnê ne. Hewldan û helwesta ku li dijî politikayê dewleta dagirkir xwe nîşan dide, her wiha bîr û baweriya civakê jî bi rîk û pêk dike; bi encam nîrxêneteweyî derdixîne pêş. Heger ev nebin, di pêvajoya têkoşîna neteweyî de bûyerîn negaîv zêdetir dibin, serkeftin ji mirov dûr dikeve. Jixwe mirov çawa dê zanibe ku gel di bîr baweriye de gîhîşive qonaxa serkeftinê?

Rast e, di hemû têkoşînen neteweyî de barê giran li ser milê hinek kesan e. Ew rastî ne ji bo civaka me bi tenê, her wiha ji bo hemû civakan wisa ye. Ancax şeref û rûmet jî wisa parve dike. Kesen ku barê giran didin ser milê xwe û malbatâ xwe, para wan a şeref û rûmet jî ew qas bilind dibe. Heger ew rastiyâ mirovatiyê nebûya, gehrîmantî nedibû; bi kurtî dîrok nedibû.

Nîvîsen min zêdetir wê li ser mijarêni siyasi, diplomatîk, pîrsen stratejîk, rewşa Rojhilata Navîn, pîrsen kurdan ên siyasi, tevgerî, civakî, dîrok û hwd. bin. Ji bo kesen wekî min ku ne li welatê xwe ne, her çiqas di nav pêvajoya neteweyî de bin jî, dîsa jî bi qasî kesen ku di nav wê dijwari û germahîyê de ne, perspektifîn wan di cih de nabin. Divê mirov li ser bisikine ku ew kêmâsi kêmîrtib binin.

*Fîlozofekî Têkoşer:*

# Mahmûd Guden

Bavê min çû doşek ji ser kulînê anî, da ku ew li ser rûne. Hevalê Mahmud ji bavê min re wisa got: "Apo em dixwazin ji gelê xwe re xizmetê bikin, ne ku gel ji me re xizmetê bike. Em li ser doşekê rûnanin. Heta niha, we ji axayan re doşek daniye, dîsa ji wan re deynin." Bavê min wisa got: "Ji niha û pê ve bi tenê şoreşger dikarin li ser doşekê min rûnin."

**N**ivîsîna jînênîgariya pêşewayên wekî Mahmûd Guden karekî dijwar e, pisporiyê dixwaze. Mirov tenanet dikare hêleke wan binivîse. Di jiyana kesen bi vî rengî de, hem têkoşina bo azadiya gel xuya ye û hem ji kevneprestiya ku gel tê de fetisiye, tê ber çavan. Anglo jiyana van kesan, wekî mirêkî ye û diyalefik e. Li hêlekê li hemberî kevneprestî û şovenîzmê têkoşineke bê-aman dide, li hêla din ji qor bi qor bingeha azadî û serxwebûnê datîne. Mirov di têkoşna kesen wekî Mahmud Guden de xetermakiya paşverûtiyê dibîne û bêhtir rûmeta azadî û serxwebûnê fam dike. Rêheval Mahmud li her devevê behsa welêt, rûmetiya azadî û serxwebûnê dîkir û bal dikişand ser vê gotina Hochi Minh: "Ji serxebûn û azadiyê bi rûmetir tiştek nîn e."

## "Ma Apocî ji zana ne?"

Di sala 1991'ê de ji doza PKK'ê ez hatim girtin. Leşkerên Tirk bi cemseyê ez ji gund birim Dêrikê. Dema em nêzikî, cihê ku lê Şerê Gabarê qewîmîbû, bûn, serlesker bi dûrbîna xwe nihêrî û ji yê tenîşa xwe re wisa got: "Me, di sala 1980'yî de, li vê derê 4 PKK'yî kuştin." Ev der, cihê berxwedana Mahmud Guden û rêhevalen wî, paş gundê Tilbîsimê bû. Ev gund li ber navçeya Dêrikê ye. Niha dewletê tabûrek, li hemberî cihê şehadeta wan, ava kiriye.

Min, Hevalê Mahmud di sala 1979'an de nas kir. Ew û hevalekî xwe hatin gundê me û şevekê bi mîvanî li mala me man. Li wan, gelek xortê gund vêhewîyan û heta destê sibê axivîn. Mijara axaftinê, dîroka cureyên civakan yanî civaka komûnal, koledar, feodal, kapitalist û sosyalist bû. Bi piranî li ser civaka Kurdistanê, dîroka parçebûna wê û di vê yekê de rola eşîran, hate rawestandin. Dîsa behsa astengên li ber serxwebûn û azadiyê ji hate kîrin.

Wê demê xortê gundê me qet ji Apoçîyan hez nedikirin, lê li Mahmûd Guden baş guhdarî dikirin. Hevalê Mahmûd çarmîrkî rûniştibû û bi awayekî zanîstî dipeyivî. Tê bîra min, bavê min çû doşek ji ser kulînê anî, da ku ew li ser rûnê. Hevalê Mahmud ji bavê min re wisa got: "Apo em dixwazin hinekî ji gelê xwe re xizmetê bikin, ne ku gel ji me re xizmetê bike. Em li ser doşekê rûnanin. Heta niha, we ji axayan re doşek daniye, dîsa ji wan re deynin." Bavê min piştî gotina wî ecêb ma û wisa axivî: "Ji niha û pê ve bi tenê şoreşger dikarin li ser doşekîn min rûnin. Êdî axa û beg nikarin



Hevalekî Mahmûd Guden bo wî wisa digot: "Ev gotinê her tim di bîra min de ne. Wî digot: 'Divê mirov bi zanîstiyê baş bizane. Ji bo serkeftinê zanayî û şarezatî şert e.' Ji her vê hindê tim di çentê wî de du sê pirtûk hebûn." Ew filozofekî têkoşer û çekdar bû. Niha ji bi sedan hevrîyên wî, wekî wî bi çekdarî filozofiyê dimeşînin.

rûmin". Her wiha xortan ji ji hev re digot: "Ev çawa Apocî bû law! Me digot qey kes wekî hevalen me ne zana ye û Apocî bi tiştekî nizanîn, ji silehê pêvetir. Lî viya ne wekî Apocîyan bû. Bi her tişti zanabû û gelekî ji doza xwe bawer bû. Tişten em ji hevalen xwe ne elimîn, em ji wî elimîn. Wekî gens, klan."

Belê di mîjiyê bavê min û xortan de raman û zanabûna PKK'ê, bi şexsiyeta Hevalê Mahmud cih girtibû. Jixwe tişte girîng ji ev bû. Hevalê Mahmûd bi tevger û zanabûna xwe di dilê gel de cih girt. Pêşewayê Şerê Azadiyê berê kevneprestî û feodalîzma di serê kurdan de derizand, dû re ji di dilê mirovê kurd de tirs û xof şikand û stargeha mîrxasîyê danî.

## Partî li her derê ye

Bû sibe. Hevalê Mahmûd û hevrîyên wî taşteya xwe kirin û ji bo xebat û belavkirina belavokan, bi peyati berê xwe dan gundê kîleka me. Li ser vê tevgerê ji gundê me Apê Bişar ji wan re got: "Lawo dinya germ e, havîn e! Hûnê ji tîna bimirin. Werin ez ê we bi teksiyê bibim."

Hevalê Mahmud wiha lê vegeand: "Apo, emrê partiya me ev e ku, em peyati bigerin û xebata xwe bikin."

Apê Bişar heyirî û wisa got: "Lawo, ev ci gotin e! Werin ez we bi teksiyê bibim. Ma ka Partî li vir e??"

Hevalê Mahmûd dîsa lê vegeand: "Partî wekî bêhn û hilma me ye. Ruhê me ye. Berî her tişti gerek e mirov durûtiyê neke. Em nikarin Partiyê bixapînîn. Bi xapandinê azadî û serxwebûn bi dest nakeve." Apê Bişar dev ji wan berda, lê bi wan keniya û got: "Lawo! Wele ev dînitî ye." Mahmud û hevalê wî berê xwe dane gund û meşîyan. Gundiyân ji li ser xaniyan li wan dînihêrt.

Berî darbeya leşkerî yâ 12'ê rezberê 1980'yî, xebereke nebixêr gihişte gundê me. Mahmud Guden û 3 hevalen wî, li paş gundê Tilbîsimê şehîd ketibûn. Havîn bû. Ku kê ev xeber dibihîst, eniya wan ji xwêdanê dibû wekî avê. Gelê kurd dîsa lawekî xwe yî leheng ji dest dabû, lê wî doza xwe biribû serî û tovîn serxwebûnê û azadiyê li navçeya Dêrikê avêtibû. Neyar, cendekên Hevalê Mahmûd û hevalen wî, bi têlan avêtibû paş

Doçê û heta navenda Dêrikê kaş kiribû. Bi vê yekê armanc tirsandina gel bû.

Hevalekî Mahmûd Guden di sala 1990' i de ji min re wisa gotibû: "Ez jî çûm ser termên wan. Dema min Mahmûd nas kir, canê min germ bû. Wê kîlikê kîna neyar çawa kete dilê min, ez hîn jî nikarim bînim zîmîn. Min got qey xwîna canê min êdî çep digere. Lî ev gotinê wî, her tim têbîra min: 'Divê mirov bi zanîstî baş bizane. Ji bo serkeftinê zanayî û şarezatî şert e.' Ji her vê hindê tim di çentê wî de du sê pirtûk hebûn."


Mahmud Guden ji wekî şehîden azadiyê yên din bûbû xelekek. Ev xelek ji bo gelê kurd wekî morîkîn rengo rengo ye û pê xemîlî ye, ji bo neyar jî bûye toqa fetisandinê. Şehîd ji, ji berê bêhtir di dilê gelê xwe de dijin. Bo hevalê nemir Mahmûd Guden wisa tê gotin:

Hevalê Mahmûd e qehreman  
Şoreşgerê roja giran  
Xwîna xwe li ser xetê danî  
Bo rizgarîya me kurdan

□ 14 Gelawêj:

**Ahmet Kesip (Cemşit) şehid ket**

Ahmet Kesip ji bajarê Îdirê ye. Li herêmén Qers, Agirî û Şemzînan ku li ser Çolemergê ye hatiye peywirdarkirin. Tevi Mehmet Artûr û Fuat Aslan re digel artêşa tirk li herêma Agirî nêzi mehekê dikevine şer. Ahmet Kesip di Komelvîna sêyemîn a PKK'ê de bûye Endamê Komîteya Navendî û Konseya Leşkerî. Di raperîna 1987'an de peywîreke girîng digire ser milê xwe. Li Benavokê ku li ser herêma Şemzîna ye bi heş hevalên xwe re digel artêşa tirk dikeve şer û tevlî refî şehîdên şoreşê dibe.

**BÜYERINE JI DİROKÊ**

9-12 gelawêj 1925:

**□ TevkijiyaRaman û Reşkotanê**

Piştî serhildana Şêx Seîd di navbera 9 û 12'ye gelawêja 1925'an de li herêmén Raman û Reşkotanê ji hêla Komara Tirk ve tevkuiyek pêk hat. Armanca vê tevkuiyê temirandina cirûskê agirê ku ji raperîna Şêx Seîd mabûn bû.


# Mamoste-Rojnamevan Hüseyin Deniz

Hüseyin Deniz kesekî bir-yardar bû. Ev bîryar di warê nivîskariyê de bi pêk dianî lê her dem daxwaza biratî û wekheviyê dianî zimên. Wî li ser, aştiyê, di quncikê xwe yê hefteyî de wiha dinivîsand: "Bi gerîllyan re lihevkirin." Xwesteka wî wek a hemû gelê kurd bû.

**S**al 1992 roj 9'ê tebaxê bû. Tebax(gelawêj) germ e lê hênikahiya sîbê bû, hênikahiya sîbê xew xweş bû, lê ne dema xewê bû. Dema kar û xebatê bû ji bo rewşenbîrê kurd mamoste û rojnamevanê heja Hüseyin Deniz. Wî xwe amade kiribû ji bo karê rojê, û wî her roj ev kar dikir.

Rojnamevanî karê wî bû di ramanê wî de biratî û wekhevi hebû. Kesekî dilgerm bû. Azadî daxwaza wî bû ji bo vê daxwazê kar û xebat dikir. Di warê rojnamevaniyê de karkerekî sên bû.

Mamoste, Hüseyin gelek zilm û zor dîtibû, di salen 80'yî de di Zindana Amedê de mabû. Tiştîn nebûyî û nemayî wahseteke mezin dibû. Wê wehsetê ew mecbûri nivîsandînê kiribû lê di bingeha wî de nivîskarî hebû; xwarziyê, Musa Anter bû. Hüseyin Deniz kesekî bi qirar bû. Ev bîryar di warê nivîskariyê de pêk dianî lê her dem daxwaza biratî û wekhevi dianî zimên. Wî li ser, aştiyê, di quncikê xwe yê hefteyî de wiha dinivîsand: "Bi gerîllyan re lihevkirin." Xwesteka wî wek a hemû gelê kurd bû. Dixwest ku biratî aşti û wekhevi bê, gelê kurd jî wek hemû gelî azad bijî şer û zilm û zor ji holê rabe û êdî bes xwîn birije, dayik bes hêstran bibarînin. Û dilê wan nema




bîşewite, lê ev fîkî û ramana wî bi kesê şerxwaz û xwînmij, hêzên tarî re giran dihat, pênuşa rewşenbîr ji wan re bûbû kelem û dest bi qetilkirina rojnamevanan kir lê bi qetilkirina rewşenbîr rojnamevan û nivîskaran gel û rojnamevanî hîn bi pêştit ket. Wan hêzên tarî bi qetilkirina Hüseyin Deniz ji xwe re tiştek safî nekir. Di vê xwîna pîroz de roj bi roj dixenikin. Bi rastî tirêjîn rojê yên di nav tariyê de nayêni veşartin. Bê guman daxwaza van şehîdan û a hemû gelê kurd ev e; biratî aşti û wekhevi ye. Diyar e ku gelê kurd bi rêça ku wan daniye de dimeşe. Bi sedan, hezar û milyonan birayê min, hevalên hêja pênuşa wê rojnameya ku, we bi xwîna xwe daniye bi kar tînin. Birayê min tu di germahîya tebaxê de tevlî kerwanê şehîdan bûyî, bila tu û hemû şehîdên çapemenîye yên din, di axa welat de bi dilrihetî razîn, hûnê di têkoşîna gelê kurd de, her dem bijîn; hûn rûmeta jiyanê ne. Ez bi hurmet bejna xwe, li ber şehîd bûna te û hemû şehîdên azdiyê ditewînim û bi hurmetî, bi bîr tînim. Bê gûman hûn şehîd in. Şehîd Namirin.

EDLA DENİZ

**CAVDÊRÎ**

Çar rûmetên neteweyî



SERKAN BRÜSK

**M**eha tîrmehê, ev meha ku me li pey xwe hişt, meheke girîng e di dîroka berxwedana tevgera rizgarixwazî de ku li bakurê wîlêt dest pê kir û iro bûye hêviya hemû kurdênu ku bi dirêjiya salan e li benda azadiyê ne. Hêviyeke wisa ku firêjîn wê bi ronahî û germahîya xwe, hemû şenîyên welatê jîbîrbûyî, germ dike.

Çewsêneriyê berî niha bi çardeh salan li Zindana Amedê jiyan ji xwe re teslim girtibû û ew ji xwe re sond dabû lê bi mirina, na bi bêmirinbûna çar cangoriyên herî bi rûmet ên xaka bêrdar, hêvi dîbû rastî û jiyanâ bîrûmet serê xwe ji nû ve radikir.

Xwe ji nav çar dîwarên ku bi kevirên vî welatî hatine lêkirin rîzgar dikir. Xwe digihand çiyan û dîbû teqîn û bi jîyana ketî de diteeqi.

Dema ku çavşorîyê bi hemû metodêne xwe yên kîrêtu ji dîroka xwe wek malkur wergirtiye, bi ser têkoşerên jiyanâ azad ve hatibû, pêrgî vîna wan bûbû. Wan bi bedena xwe ya lawaz ku vîneke bi qasî çiyyâyen Kurdistanê di nava xwe de hildigirt, ji çewsêneriyê dest bi dar re gotibûn: "Bisekin! Ma çend û çend ji te re. Ji vir û ha de berxwedan e. İمام e. Bawerî ye."


Vîna wan bûbû barîqat û bend, li hemberî neviyên Cengîzhan ên dest bixwîn. Çar vînên bi qasî rojê pîroz, bi qasî avê bîrûmet, bi qasî axê bibêr. Dema mirov yeko li kurtejiyana van mirovan dimeyizîne, mirov dibîne ku ev her çar cangorî bi awayê jiyanâ xwe, bi hilbijartina xwe ya siyâsî û bi tevgerên xwe yên di nava rîexistinê de kesen pîrozwer in. Jîxwe ji awayê çalakiya wan jî dixuyê ku ew çawa bi bîr û bawerîya xwe re bûne yet. Çawa ku muzîsyenek bi notayê xwe re, helbestvanek bi helbesta xwe re, stranbêjek bi kilama xwe re û çawa zanyarek bi zanista xwe re bûbe yet, ev her çar pîrozwer ji bi bîr û bawerîyen xwe re bûbûn yet. Wan berxwedan bi xwe re heta wê quncika teng a zindanê ji biribûn. Ew li wir wekî atomekî di asasê çewsêneriyê de berdabûn û bi vê teqînê re, avahiya tîrsê ya ku di mîjîyê gelê wan de hatibû lêkirin hilweşiyabû, pê re ji nav vî kavîlê han berxwedana gelê kurd a ku roj bi roj bilind dibe, şîn bûbû. Û wek roja germ a vê meha pîroz li azadiya derengmayî hilatibû, germ kiribû. Hînek mirov, bi hînek çalakiyên xwe yên girîng mohra xwe li beşek dîrokê dixin û dibin rûmeta gel. Xwedîyê van çalakiyan ji ber awayê çalakî û a gîringtir ji, ji ber girîngbûna pêkanîna van çalakiyan di çavêni mirovahîye de digîhîn merheleya herî bilind. Di vir de em divê çalakiya van mirovên ku bûne rûmeta neteweyê û hînek çalakiyên din bi xetêni qalind ji hev veqetînîn û destûrê nedin ku hînek çalakiyên bi ximamî ber bi axa van çalakiyan ji bikevin.

Em divê vê ji bîra nekin ku livbaziya, Kawayê Hemdem, Mazlum Doğan, Zekiye Alkan, Rahsan Demîrel, Zeynep Kınacı, Ronahî û Bêrîvan, ên zindan û gerîlla, dîrokî ne. Wezn û giraniya çalakiya van encax dikare bi mîzêna dîrokê were weznandin. Ger em iro di dilê Lozana ku peymana parvekirin, talan û jîholêrakirina gelê me lê hatiye îmzikirin de, bi munasebeta mehkûmkirina vê peymanê konferanseke navneteweyî li dar dixin û vê konferansa dîrokî, bi riya televîzyona MED'ê li sih û çar welatên cîhanê belav dikin, gelo ne rasterast bi encamên van çalakiyan ve girêdayî ye?

Ger em nikaribin encama têkçûna Peymana Lozanê, ku di 24'ê tîrmehê de pêk hatibû, bi serkeftina çalakiya çaran û hevalbendê wan ve girêdin, dê dîrok careke din me nebexşîne û dê vê carê rûyê xwe heta hetayê ji me biguherîne û ba bide.

Wênekêşê kurd Nedîm Ado:

# Ez lawê rojeveke gelêri me



Nedîm Ado

HEVPEYYVİN: HELİM YUSIV

*Nedîm Ado ev e, lê çi berê wî daye wênekêşiyê, ji ku dest pê kir?*

● Ji biçûkanî de min ji fotografan hez dikir. Min tim dixwest kamerayeke baş di nav destê min de hebe. Ez ji dixwazim tiştê ku ez jê hez dikim, bigirim û di cih de rawestinim. Çi bala min dikişand, min dixwest ez wî di cih de bigirim û di wê kîlîkî de bisekinînim. Di fotografan de tim tiştîn spehî û nexweşik ligel hev in. Spehîbûn jî dimîne armanca wênekêş. Nemaze hinek wêne hene nayêndubare kirin, mînaka Helebçe berbiçav e. Tekiliya fotograf bi hestan re gelekî xurt e. Ji ber vê yekê pirî caran hestên germ fotografekî spehî diafırîne.

*Pêwendiyê te, hesten te û fotograf bi hev re çawa têna sazkirin?*

● Her mirov dikare bibe wênekêş, lê naveroka tekiliya bi wêne re, huner ji wêneyê normal cihê dike. Divê mirov xwedîyê ramaneke be, da ku wêneyekî çêbice. Her wisa divê tekiliya wî bi huner re hebe, ji bo ku wêneyekî tijî hest û spehî saz bike. Ji bo vê yekê divê tekildarî ramaneke be û hesten huner li cem wênekêş bibin pîvan. Gelek caran em gelek dîmenan dibinîn ku hêjâyî wênekêşiyê ne lê di nav wan de wêneyek tenê nêzîkî hesten mirov dibe. Raman wêne diafirînê û raman ji hesten germ têna pê.

*Em hinekî li ser fotograf û resîm rawestin, ci têkîli di navbera wan de heye?*

● Min li Helebê li Navenda Hunerên Resîmsaziyê xwendîye. Di sala 1981'ê de min gelekî ji peykersaziyê hez dikir. Ji bo tabloyê dîtineke hunerî girîng e, ava kirina tabloyê pişti xwendinê tê pê. Têkîli bi sî û ronahiyê re heye. Demeke taybet jê re divê. Ev merc di kîjan tabloyê de he-

## NEDÎM ADO:

Wênekêş Nedîm Ado, di sala 1966'an de li Efrîn ji dayik bûye. Ado, li Şamê endamê Salona Hunera Wênekêşiyê ye. Nedîm Ado, heta niha bi tenê û bi hevbeşî gelek pêşangeh saz kirine: 1986 - Salona (Muslim) Methefa Helebê, 1993 - Navenda Çanda Emerfîki ya li Şamê, 1994 - Navenda Mîsyaf, "Hefteya Çandî ya Helebî, 1995 - Salona Bîlad Elşam, li ser "Luey Keyalî, 1996 - Navenda Çandî ya Spanî, 1996 - Mîhracanê Fotografan a Yekemîn li Helebê, 1998 - Salona Bilad Elşam (Silav bo Nebîl Qetaya), 1998 - Salona Ele-sed ya Hunerên Çak (Yekîtiya Rojnamevanan). Her wiha Nedîm Ado besdarî hemû pêşangehê Salona (Nadî) Hunerê Wênekêşiyê bûye. Ado, di rojnameyê Sûrî de yên wekî Cemahir, Tişrin, Sewra de xebitiye û di telewîzyona Sûrî de di çend xelekên filmên televizyonê de fotograf kişandine, wekî Süreya, Ehil û Hebâyib, Merîhûn, Soban. Kevalên (tabloyen) fotografên Nedîm Ado, li Beyrûd, Kuveyt, Amerika, London, Keneda, Swêd û navenda çandê li Helebê belav bûyne.

bin, wê tabloyeke xweşik derkeve holê. Rola herî mezîn di tabloyê de ji amûrên bikaranînê re ne, kamera, çavê hunermend. Di encamê de afirandin pêwîst e, çi di resîm de be û çi di fotograf de be.

*Rewşa wênekêşiyê li Rojhîlat û Rojava çawa ye?*

● Li Sûriyê karê wênekêşiyê nû ye. Di 1983' yan de ev Salona Nadî çêbû. Gelek hunermendê ku fakulteya hunerê kuta kirine, ev kar kir. Li gelek deverên Ewrûpayê humera wênekêşiyê wekî beşike ji xwendina akademîk tê dîtin û faktüleyen cihê jî hene. Di sala 1995'an de mala hunera wênekêşiyê li Parisê hate sazkirin û entîkexanayeke (mûze) taybet ji fotografen hunerî re çêbû. Di vê entîkexaneyê de arşîva wêneyan ku ji destpêka bikaranîna kamera heta wêneyan civandine. Her wiha li Spanyayê entîkexaneya qrala "Sofya" hate sazkirin.

*Di nav wênekêşen Sûriyeyê de, taybetiya xwe, tu di ku derê de dibîni?*

● Li ser min, bandora tu "uslûbê" taybet tune ye lê tim divê ramaneke nû hebe, ku di riya wênekêşiyê re bi kar bê. Evyek di van waran de tê dîtin: Rewşen mirovan, hesten xweşîkbûnê, bûyer, reng di fotografan de. Bi kurtayî tu dîmenan didî temâsevan. Di her pêşençeyekê de ez dîtineke nû, lêkolîneke nû didim temâsevan. Raman li ber çavê herkesî ye lê wênekêş hunermend, wê ramaneke bi kar fine û bi wî awayî ji hunera xwe tîne pê.

*Bi dû sazkirina fotograf de, ramaneke spesîbûnê heye. Gelo ramaneke cîvakî, siyasi, ideolojîk dikare bibe stûna wêneyekî nû?*

● Dibe em qala wêneyê tewsiqî (dokumendkirin) bikin, wêneyê musadefeyê, dibe ku xweşik be û dibe ku nexwe-

sık be. Lê ya girîng, ku pişti demeke dirêj wêne bûyerê bixwe bîra mîrov. Gelek besen wênekêşiyê hene, wênekêş fotoğrafîyê hunermend, wênekêş rojnamevan û wênekêş musadefeyan. Yê yekemîn, raman dibe muxteberê karê wî, gelekî bi ramanê re mijûl dibe, da ku tabloyeke hunerî saz bike. Yê duyemîn jê tê xwestin ku bûyerê gav bi gav, kîlîk bi kîlîk bigire. Di vê girtinê de, wê çend wêneyen balkêş û nimûneyî derkevin. Ev jî divê gelekî bi lez karê xwe biqedîne. Wekî wêneyen bêşirove yê rojname-

şik derdi keve. Her wisa gava hunermend xwedî agahîyen kûr û fireh be, wê bêhtir wêneyen wî, hunera wî tijî spehîti bin.

*Tekiliya rojeve bi wêneyen te re çawa tê ristin? Nemaze tu li Helebê dijî...*

● Di warê hunerî de dibêjin, hunermend lawê rojeva xwe ye, lawê axa xwe ye. Rojev awayê karê wî nîşan dide. Mînaka Fatîh Muderis, heta niha di bin bandora diya xwe de, ji pêncî salî heta niha Efrînê resim dike. Di wênekêşiyê de rojevê hinekî biçûk e, qels e. Ji ber ku



yan. Yê sîyemîn di karê xwe

yê rojane de, carina sudfe wêneyekî taybet diafirîne. Ji nişke ve balê dîkişine û dibe nîşana kameraya wî, ev wênekêş sudfeyê ye.

*Agahdariyên hunermend, heta ci pêpelükê alîkariya wî dîkin û hunermendiya wî dîparêzin?*

● Ez xwe gelekî nêzîkî nivîskar û torevanan dibînim, ew hevalê min in. Dema ez helbest, kurteçîrok, romaneke xweş dixwînim, gelek wêne li cem min saz dibin. Ev agahdarî wêneyekî ramanî, helbestî çêdike. Helbest carinan dibe kaniya wêneyan. Çand pêwîstiyek e. Dema bi zanabûn wêne bê kişandin, bêhtir xwe-

wêne nayê dubarekirin. Ez lawê rojeveke gelêri û taxên kevn im. Di pêşençeyekê de min Heleba kevin pêşkêş kir. Min hesten xwe bi vî cihî ve dan eşkerekirin.


Dema rojev wêneyen xweşik diafirîne, ev rojev bandorê li wênekêş jî dike. Ez tim li tiştekî girêdayî hunerê digerim. Her rojev dibe ku bibe kaniya wêneyen spehî. Divê wênekêş tim afirandin bide pêş. Rojeva me bi wêneyen ku hîn nehatine kişandin pir zengîn e. Bajar û gundêne me tijî reng û babeten hunerê ne. Jineke gundi, bi cilêne rengînî girêdayî, bi xwe ew tabloyek e. Ev tablo jîxweber tê saz-kirin. Ev yek jî hêzê dide hunerê.

*Siruştâ Efrînê pir balkêş û bi deng e.*

Kurd derbasî qonaxên li pêş bûne. Me derhînerekî wekî Yilmaz Güney û hunermendekî wekî Omer Hemdî û helbestvanekî wekî Şêrko Bêkes afirandiye. Tevî belavbûn û bêwelatbûnê jî, em dikarin li cîhanê di meydana hunerê de cihê xwe bibînin. Her wiha em çiqasî bi zimanê xelkê biaxivin jî lê dawiya dawî zimanê mirov zimanê diya mirove.



Ê rojeveke gelêrî û taxên kevn im. Divê wênekêş tim afirandinê bide pêş. Rojeva me bi wêneyênu ku hîn nehatine kişandin pir zengîn e. Bajar û gundêñ reng û babetêñ hunerê ne. Jineke gundî, bi cilêñ rengîni girêdayî, bi xwe ew tabloyek e. Ev tablo jixweber tê sazkirin. Ev yek jî hêzê dide hunerê.



*Wekî diyar e wênekêşî wêneyênu awarte dixwaze. Gelo ev siruşt bi xurtî di tablo-yen te de bi rola xwe radibe?*

● Siruştta Efrinê... Ez hinekî li dûrî wê mezin bûme. Ez li Helebê mezin bûm. Carinan ez diçim serdana Efrinê. Lê min siruştta Cezîrê (Qamîşlo) bêhtir nas kir û ya bi taybetî "Serê kaniyê". Du heftan ez li Qamîşloyê mam. Em çûn seyranekê. Ji Serêkaniyê heta Dêrîkê, heta Pira Romanî min dan ber kamera xwe. Gelek wêne di ber çavê min re derbas bûn. Min gelek wêne li ser Qamîşloyê û gundêñ wê çêkirin. Ez pê hest bûm ku pîrbûna serdanê Qamîşloyê dihêle ku jixweber wêne bêñ holê. Li "Tirbesipiyê" ez li dawetekê hazir bûm. Karnavaleke ji rengan bû. Folklorâ me di warê rengan de gelekî zengîn e. Dîsa gundêñ Qamîşloyê jî pir zengîn in. Orf û adetêñ wir, nemaze dema danûwan çedikin, dîmenêñ ku agir û zarok diafirinîn geleki balkêş in. Li wir min gelek wêneyênu te-nûrê kişandin. Di riya dost û hevalan re min ji nêzîkayî ve suriştta Qamîşloyê nas kir. Lê kêm caran ez bo Efrinê çûme.

*Di vî karî de, hunermendêñ kurd pir kêm in. Çima? Eger hebin kî ne? Hunermendiyâ wênekêşê kurd di vî warî de, çawa ye?*

● Di civaka kurdfî de, kîmbûna hunermendan balkêş e. Lê ev rewş di tevahîya civaka sûrî de jî heye. Gelek resimkar derketin. Rê bêhtir li ber resmê vekirine û di fakulteya hunerê de ev bes têne xwendin. Lê wênekêşî nebûye warê xwendinê. Ez lawê bajêr im û xwendina wênekêşiyê di navendêñ taybet de nîn e. Ya din, ji ber ku civaka kurd teng e û ne xwedî û ehil, ne jî civak tu alîkariyê diide hunermend, pêşketineke berbiçav nehattiye pê. Lê li Sûriyey pirê wênekêşiyâ stûdyoyan kurd û ermen in. Lê huner-

mendî tiştekî din e. Di pêşangehan de li ser min digotin: "Evê kurd, tim ramanê nû ji me re tîne." Tevî ku babet dibe erebî jî lê li keyneşopîya me ji me bêhtir di kole. Kurdayetiya me hinek zehmetiyan di têkiliyan de tîne berçavan. Tim bi çavekî din li mî dînihîrin. Lê dawiya dawî bi serketin ji hunerê xurt re ye. Çend wênekêşen kurd li Şamê, Helebê û li Hesekê hene.

*Ji bo rewşa kurdan li vir û li her derê, tu tiştekî taybet heye ku ji wênekêşê kurd tê xwestin an na.?*

● Divê girêdanek di navbera hunermend û wênekêşen kurd de hebe. Dema ez helbesteke Cegerxwîn dibihîzîm, bêhtir hestê min germ dibin. Wênekêş kurd, dema nîvîskar û hunermendêñ kurd nas bike, dikare cihê xwe di navwan de saz bike. Ligel ku bi civaka ereb ve jî tê girêdan, lê tim wê wekî kurdeki bê nirxandin. Divê hunermendê kurd, xwe di derdora xwe ya kurdfî de ava bike.

*Ji hunermend re, ji wênekêş re, di hundirê civakê de malbat heye.?*

● Her mirovekî afirîner xwedî malbateke hunerî ye, ku pir reng e. Resim, peykarsazî, şanogerî, sînema û tore...hwd. Eger wênekêş karibe têbîghêje û bi awayekî durist zimanê hunerê zanine, wê tabloyeke sewiye bilind pêşkêş bike. Bi vî awayî em dikarin bi bêjin ku derbasî vê malbatê bûye. Em kurd derbasî qonaxên li pêş bûne. Me derhînerekî wekî Yilmaz Güney û hunermendekî wekî Omer Hemdî û helbestvanekî wekî Şêrko Bêkes afirandiye. Tevî belavbûn û bêwelatbûnê jî, em dikarin li cîhanê di meydana hunerê de cihê xwe bibînin. Her wiha em çiqasî bi zimanê xelkê biaxivin jî lê dawiya dawî zimanê mirov zimanê diya mirove.

# Helbestvanekî ku “ji çîna xwe hez nake”:

# Bertolt Brecht

Lî çalakiya herî biçük jî, ya ku ji rêzê dixuye  
 Bikolin bi gumanbarî! Lê bigerin bê ka pêwist e  
 Nemaze ya ku asayî ye!  
 Em di bextê we de ne,  
 her tiştê hûn liqayê tê, hûn siruştî nebinin!  
 Ji ber ku mirov ji tu tiştî re nebêje siruştî,  
 da ku tu tiştî wekî xwe nemîne,  
 di heyama xirecireke wiha bi xwin  
 bêpergaliyeke hatîbiryardan, çewسان-  
 dinike bi plan  
 mirovahîyeke ji mirovahîyê betal bûye  
 de.

Bertolt Brecht

Gava qala Bertolt Brecht di-  
 be, ez bawer im tiştîn sere-  
 ke ku têr bîra mirov, ên ku  
 her li ser zimanê hunermen-  
 dêñ kurd in, ev in: Teatreke xwedan  
 bingehêke aza, teatra epîk, azîneya bi-  
 yanikirinê, estetîka marksist, şanonivî-  
 siyeke berhemdêr û helbestvaniya wî,  
 ya ku di nava belg û çiqlêñ daristana wî  
 re fînanî lal û dur dînisile.

Lî vir, ez dixwazim bi tenê li ser hel-  
 besta wî hinekî rawestim. Bêguman, ev  
 aliye wî, ku hê derneketiye ronahiyê,  
 pêwist e ku ligel teatra wî, bi xurtî û bi  
 kurdi dûr û dirêj bête nirxandin. Ezê bi  
 mînakine ji helbesten. wî, jînenîgariya  
 wî bi vebîrî vebêjim.

Erê, tevî ku xwedîyê ew qas xebat,  
 gewşîn û berhemên peywendîgîrî warê  
 teatrê ye, Bertolt Eugen Friedrich  
 Brecht, di domahiya temenê xwe de nê-  
 zîkî hezar û du sed helbest nivîsandine.  
 Bi jidayikbûna xwe re (10 resemî 1898,  
 li bajarê Aûgsbûrgê li Almanyaya Ba-  
 şûr) angô di temenekî biçük de dest bi  
 serboriyeke balkêş, dijber (demeke  
 nîperest – ajewatiperest) û tûj kiriye.  
 Di nameyeke xwe, ya ku bo hevalekî  
 xwe nivîsiye de, wiha gotiye: “Çar sal-  
 ên di dibistana seratayî de, ji bo min  
 cihê bêzariyê bûn. Di neh salêñ min ên  
 di liseyê de, min nekarî guhartineke  
 gi-ring li ser mamosteyê xwe pêk bînim.  
 Mêla min a li ser tiraliyê û xweserêx-  
 webûnê bala wan dikişand.” Jê bêhtir,  
 Brecht çêli guhartina ramanî, ku di  
 demeke kin de lê rûdaye, bi helbesta xwe  
 ya ku di sala 1938’î de nivîsiye, wiha  
 dike:

## Terikandina Heyna Berê Ya Xwes

Ez kurê mirovén  
 Dewlemend bûm. Malbata min  
 Berstûyek bi min de kir û ez mezin  
 kirim  
 û kirim yekî ku wê xizmet lê bê kîrin û  
 ez fêri  
 Hunera fermandayinê kîrim. Lê  
 Gava mezin bûm min li dora xwe nihê-  
 ri



Min hez nekir ji mirovén çîna xwe  
 Fermandayinê û xizmetxwestinê  
 Û min çîna xwe terikand ez  
 Tevî xizanan hûm

Mirov helbestvaniya Brecht dikare  
 bi “Partî” yê sînor bike. An jî bereyeke  
 nor (dijber) heye ku, ji hêla din ve rûyê  
 xwe reş dike, bi serkeftinê xwe yên  
 demdemî. Anglo Bertolt Brechtê kurê  
 Reşedaristanan\* di xwesiya xwe de û  
 hîn jî ji aliye xêrnxewazên mirovahîyê  
 û “hunermend” ên berdevk ên çîna si-  
 war ve nehatiye pejirandin û “yên li jo-  
 rê” tim di awat û hêviya pûçkirina vî  
 mîrikî de gevizîne. (Cihan hespekî or-  
 xe ye; kê, ku zûtir dest bire hefsîr, kê-  
 fa wî saz e. Digel ku ew çend netewe û  
 rencber di bin siman de diçin, xema si-  
 wêr nîn e!) Lî wî ji wan rojan de den-  
 gê xwe û ramana Partiya mezin vêk re,  
 hiştîye ji me re :

## Pesnê Partiyê:

Du çavêñ te hebin  
 Hezar çavêñ partiyê hene  
 Bajarê her hevrêyê me ku jê ve nas e  
 Her pênc parzemînan jî dizane partî.  
 Her hevrê dem û demjimêrek heye  
 Lî ya partiyê demjimêra dirokê ye  
 Dibe ku bikaribin her hevrêyî tune bi-  
 kin

**Bertolt  
 Brecht, bi  
 jiyan û  
 nivîskari-  
 ya xwe  
 iro jî  
 mijara  
 dem-  
 bûhêrkên  
 wêjeyî ye.  
 Her çiqas  
 ew  
 sosyaliste  
 kî tun-  
 draw bû jî  
 derdorêñ  
 kapîtalîst  
 jî vê  
 dawiyê  
 “pesna”  
 wî didin.  
 Ew, 14  
 gelawêjê  
 di sala  
 1956’ an  
 de cû ser  
 dilovaniya  
 xwe.**

Lê partî ne heft, hezar can  
 e  
 Ji ber ku ew pêşenga şenîyan e  
 Ü ew, bi rê ve dibe şer  
 Bi şûrê şaheserên  
 Ku bi zanatiya rastiyê hatine hûnandin

Me di nivîsa xwe de qala hejmara  
 helbesten Brecht kir. Erê, wî her sal nê-  
 zîkî sî helbest rêtine. Taybetiya herî  
 gi-ring ku em di hemû hunera wî de di-  
 bînin, di helbesten wî de jî li dar e. Ew  
 jî dîsa “azîneya biyanîkirinê” ye. Ew di  
 navbera salêñ 1914 û 1956’ an de, di  
 navbeyna cil û du salan de ji aliye hel-  
 bestê ve serboriyeke pirreng, pîrhîl, têr  
 lêkîlîn û lêgerîn jiya. Wî ji hêza vegotî-  
 na tinazwer û qerfok a “balad (ki-  
 lam)” an gelekî sûd wergirt. Ji ber vê  
 yekê ye ku, wî ramana xwe ya guherîn  
 û guhartînê pir bi hêsanî ragihandiye  
 dilêñ xwendevanan. Bo nimûne, bûye-  
 reke ramyarî bi şêwe û şemala gelêri  
 wiha dixe helbestê :

Hindenbûrg generalekî\*\* neqenc bû  
 Karesatê rû da li dawiya şer  
 Almanan got ku, malik lê mîrat be  
 Qe nebe em wî bikin serok

Berhemên Heyama Barok, ku di  
 sedsalâ 17’emîn de, di wêjeya almanî  
 de ji xwe re cih vekiriye, bandor li hel-  
 besta Brecht kiriye. Wêjeya Barok a ku

pişti Şerîn Sî Salan (1618-1648), piş-  
 şewat û şikestinê wan şeran derke  
 holê, berhemên wêjeyî ji xapînokiy  
 “Roja Axretê”, “Xwesiya Bihuştê”  
 “Tîrsa Dojehê” rizgar kir û berê wêjey  
 da jiyana rojane. Vê jî kir ku muzîl  
 reqs û helbest di devekê de biginijî  
 hev du û ligel hev du bêñ hûnandî  
 Pişti vê heyamê bi demekê, ev nût  
 winda bû û wêjeyî dîsa bû kar û mijûlahî  
 ya kesine bijarte û aristokrat. Brecht ji  
 ber vî hawî, ji bo ku besera wêjeya al-  
 manî xwes bike û zimanê wêjeyê  
 hemdem nû bike, berhemên Heyama  
 Barok ji xwe re wekî nimûne bi ka-  
 anîn.

Helbestvanê Frensi Paul Valery ji be-  
 ku gotinek wekî helbest bê hesibandin  
 sê mercan datîne ber me: “Pêwist e ki  
 gotin xwedî nirxeke zimanî bibe, pê-  
 wîst e ku tiştîk bi vî zimanî tê vegotî  
 bibe (siruşt û mantîqa zimên) û pêwîs  
 e ku tiştîn tê vegotî zelal bibin.” He  
 wiha, gava em bi baldarî li helbestê  
 Brecht dînihîrîn, ev mercen navbor  
 yekser xwe didin der. Bêguman Brecht  
 di hin qomaxên xwe de, çend rîz û ma-  
 likîn ne di vê tayê (ast) de jî nivîsandi-  
 ne. Tewr helbestine wî yên nîvhûnand  
 an nîvco hene. Lî wî bi giraniya hel-  
 besten xwe di Estetîka Marksist û Wê-  
 jeya Proleter de barê xwe bi hêsanî û  
 xwes kişandîye. Ew şarezatiya Brecht a  
 zimên ji ku tê aya? Nivîskar Ernest Bo-  
 reman wiha rave dike :

1- Zimanê gelê Almanyaya Başûr e  
 rojane 2-Helbesteke ji aliye reng, hû-  
 nandin û pêkhatinê şenber ên din ve li  
 dijî hêmâyê (imge) 3- Zimanê nivîski  
 yê fermî ku di dibistanê de tê fêrkirin 4-  
 Biwêjîn İngilizî û egzotik.

Gotina me ya dawî ku em dikarin pê  
 bi giştî helbesta Brecht rave bikin ev e  
 : Helbesta wî di warê vegotîna rasterê  
 hêsa û sade de lûtkeya sedsalâ 20’emîn  
 e. Futurîzma ku Marînettiyê italî di  
 1912’yan de da destpêkirin û ku di pey-  
 re Vladîmîr Mayakovskî ji tevî vê pêle  
 bû û surealîzma ku hema hema bandor  
 li hemû helbestvanê ewrûpayî kir, ba-  
 la wî nekişand. Lêgerîna wî ya helbest  
 ew bû ku, rîyeke zelal û peywendiyek  
 ramyarî li ber xwendevanan veke.

\*Di helbesta xwe ya bi navê “Ez  
 Bertolt Brecht” de gotiye “Ez Berthold  
 Brecht, hatim ji Daristanê Reş...” Baja-  
 rî ku Brect lê çêbûye, Augsburg, bi  
 xwesikiya xwe ya siruştî navdar e. Ji  
 ber vê yekê ev bajar, di helbesten Brect  
 de berbiçav e.

\*\*Generalekî alman ku demekê  
 Almanyayê bûye serok.

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

- **08.08.1998 şemî:** Bernameya taybetî "Ji duh û heta îro lehengên çapemeniya azad" Amadekar: Rojnameya Ülkede Gündem, saet: 15.00  
Konsera Dengbêj Salihê Şirnexî, saet: 18.00

- **09.09.1998 yekşem:** Konsera Vengê Sodîr saet: 15.00  
● **14.08.1998 1n:**

Film: Navçe (Kasaba) Derhêner: Nuri Bilge Ceylan saet: 18.00



Li NÇM ya İzmîrê

- **08.08.1998 şemî:** Konsera Koma Avreş (NÇM-Amed) saet: 18.00
- **09.08.1998 yekşem:** Konsera Koma Avreş (NÇM-Amed) saet: 17.00
- **12.08.1998 çarşem:** Semîner: "Ji bo şanoyeke Nû" Beşdar: Semih Çelenk

Li Navenda çanda Alternatifî

- **9.08.1998 yekşem:** Konsera Koma Azad saet: 15.00
- **12.08.1998 çarşem:** Film: "Şeva pênuşan" Derh: A. Galluccio, saet: 18.00

## Ji NÇM'ya Amedê Koma Avreş:

# Divê muzîk terza jiyana gerîla bîne zimê



Koma Avreş li NÇM'ya Stenbolê konser da. Kom pişti ku li NÇM'ya İzmîrê jî stranê xwe pêşkêş bikin wê dawî li tûrneya xwe bînin.

**E**w di sala 1993'yan di meha gelawêjê de bi avabûna NÇM'ya Amedê re saz bû. Komê navê xwe ji navê huner-mend û helbestvan şehîd Avreş girtiye. Ji ber ku NÇM'ya Amedê ji aliyê dewletê ve hatîye girtin, xebatê xwe niha li HADEP'a bajêr di bin navê komîsyona ciwanan de berde-wam dike. Komê pêşî bi 5 kesan dest bi xebatê kirîye. Niha tevî du kesen destpêkê, yek jin şes kes bi hev re xebatê xwe didomînin.

Koma Avreş ligel berhevkirina stran û klamêن gelêrî, bi xwe jî staranan çedike, dinivîse. Heta niha stranê ku wan bi xwe çê-kirine nêzî 15 heb anin.

Kom li ser rengê muzîka xwe wiha dibêje: "Em niha ji bo stîla muzîka ku em li ser bise-kinin, di pêvajoya xwezelalkirinê de ne. Di repertûara me ya berê de bêhtir stranê gelê-rî hebûn. Niha nêzî 'muzîka hemdem' e."

Koma Avreş di mûzîka xwe de wekî ens-tuman van amûran bi kar tîne:

Rêzan (17): gitar  
Abdulah (16): ud, cûra  
Şiyar (18): baxlama  
Sûna (18): solo  
Cihan (18): gitar

Mûrat (16): rîtm

Komê li ser 'muzîka şer' dîtinê xwe ji me-re wiha ragihandin: "Bi riya muzîkê mirov dikare xwe bigihîne kûrahiya derûniya mirovan. Bi vî rengî bandor li mirovan dibe. Mu-zîka şer a Kurdistanê li ser şer e û têkoşînê ye. Divê muzîka me terza jiyana gerîla bîne zimê."


Her wiha ew radigîhînin ku ji ber astengi-yen dewletê li Kurdistanê nikarin berhemêن xwe pêşkêş bikin. Dibêjin ku gava diçin kon-ser, an dawetan polis û tîmêن taybet rî li ber wan digirin amûrêñ wan li nav hev dixin û wan aciz dikan. Wan wiha ragihand: "Em nikarin bi azadî stranê xwe bêjin, a dilê xwe derxînîn derve." Heta niha wan li Mazra, Dî-lok û Ruhayê konser pêşkêş kirine. Car caran ji gundêñ dora Amedê, ji bo dawetan wan da-wet dikan.

Koma NÇM'ya Amedê Koma Avreş, roja 2'ê gelawêjê li NÇM'ya Stenbolê konserek da gel. Kom pişti ku li NÇM'ya İzmîrê jî ber-hemêن xwe pêşkêş bike wê vegere Amedê

A. WELAT /STENBOL

## Tîşk

Cezaya to  
panc markî ya!



LERZAN JANDÎL

**S**e ke êno zanayene, mordemî ser ra zaf çiyî derbaz benê. Tayê nê çiyan ra mordemî kenê zereweş, tayê jî kenê nêwêş, kenê tal û dajnenê. Nê hurdmîn çiyî jî mezgê mordemî de cayêde bingeyî cenê û mordem, fîkrê mordemî binê bandora nê çiyan de manenê.

Çiyê ke mordemî kenê nêwêş, kenê tal, dajnenê, zafêrî hetê nas û dostan ra ênê kerdene. Çimke eke eynî çiyî hetê dişmenî ra yan jî nedostan ra, nenasan ra bérê vatene yan jî kerdene, mordem vano "normal" o. Ez se bikerî, dostê mi/mâ, nasê mi niyo, yan jî şaro dereke wo.

Wunciya ebi na qeyde çiyê serê mi ra derbaz bî. Ez wazena wendoxê rojnameya A. Welati jî pê bizanê û an derheq de xo rê yew fikir bivirazê.

Nê rojanê nêzdiyan de ma yew iñstitûyonê ma kurdan de seba yew kombiyene ronîste yîme. Huna ke kombiyene destcinêkerd, bî, waştena hevalêde mayê kurdê cêrî "soran" ser ro, ez komputurê dînan kena seraşt. Na miyan de yew hevalêde ma kewt zere odaya ke ez tede ra û ebi kirmancî vat: "Lerzan kombiyene dest kena ci keremê xo ra bê!"

Mi jî vat "Ez miyanê 4-5 deqan de oca ra. Karê mi jî, hama hama qedîno."

Nayê ser ra hevalê ma, kurkê mayê cêrî vat: "Kekê ganî to 5 marka masa ser ro ronê."

Mi van: "Qeyî? Çinay rê?"

Ê vat: "Ma qerar gureto, kam naca tirkî qesê bikero ganî 5 marka cîrm bidêro. Şima jî kurd ê û şima hurdmîna jî kurdî zanê, ayb niyo şima tirkî qesê kenê?"

Dê mordem vano, zarava ma nêzano, qe pê nêhesiyo, qe nêheşna. La belê mordem şîkîno biperso. Senê ziwan bî, senê zar-ave biyê? Nê.

Ma kurdan de yew nêweşîye pêyda biya. Ma, ha bizanîme, ha mezanîme; çiyê ra ha xebera ma bibo, ha mebo, çiyê bişinasnîme yan jî meşinasnîme derheqê ê çî de fîkrê xo zaf "rakerde" vanîme. Yanê ma qe nêfikirîme, ke no çîyo ke ez vaa, raşt o yan jî şas o; rind o yan jî xirab o; hevalê mi tede dejeno yan jî nê. Yan jî ma qe nêfikirîme û nêvame, ez nê çî nêzana, seba nayê jî ganî ez verinde bipersî, no çik o?, çi taba wo?

Nê, niya fikiriyene, niya vatene zahmet a. A rehete, a aresteye a wa, ke hama ci amê verê fekî vacê.

Na jî qebûl. Mordem vano; de şopê bî, ma se bikeme. La belê ganî mordem dayê ra dime bifikiro. NA derheq de kemasî û şashiya xo bikero seraşt, nezaniya xo bikero zanitene.

Her çî ra ver jî ganî na xuya corêna ke pêşkarê ma biya, ganî ma xo ci ra raxleşnîme. Beno, nebeno; cawo hop hazır de; bê fikiriyene û bê perskerdene ebi nezaniye çiyanê niya tujan mek-erîme. Nê çî, çiyê qij ê, çiyê bê qedr ê, la belê mordem ke virîndiyê rî ci mecêro, rojanê ameyeneyenan de sarê ma gelê daj-nenê, ma rî, şarê ma prrobleman vecenê.

# Li bajarê Amedê serpêhatiya pismam û dotmama wî Xelîlê Ciwan

Careke ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, xênci xerabê li ber dîwaran. Li bajarê Amedê malbatek hebû jê re digotin mala Kêrman Beg. Kêrman Beg mirovekî pir dewlemend bû, bireyekî wî hebû. Kêrman Beg radibe birayê xwe dizewicîne û daweta wî dike. Di navberê re roj û sal derbas dabin, jina Kêrman Beg û jina birayê wî bi hemle dimînin. Kêrman Beg gazî birayê xwe dike û jê re dibêje ger jina min law bîne û ya te jî qîz bîne, tê qîza xwe bidî lawê min. Jinê her du bira diwelidin, jina Kêrman Beg qîz tîne û jina birayê wî jî law tîne. Navê lawik datînin Xelîl û navê keçikê jî datînin Eyşan. Eyşan dibe pêşgirtlema Xelîl. Di navberê re sal û zeman derbas dibe, bavê Xelîl dikeve û dimire, Xelîl dimîne li ber destê apê xwe. Kêrman Beg Xelîl û Eyşanê davêje dibistanê û wan dide xwendinê. Xelîl û Eyşan bi hev re mezin dabin, Xelîl dibe xort Eyşan jî dibe qîzeke xama. Dilê Eyşan û Xelîl dikeve hev û li ser hev dabin evîndar. Der û cîran ji Xelîl re dibêjîn Eyşan pêşgirtlema te ye, divê tu Eyşan nedî kesî. Xelîl ji dayika xwe re dibêje rabe here cem apê min Eyşanê ji min re bixweze. Dayika Xelîl radibe diçe hizûra Kêrman Beg û dibêje ez hatime xwezgîniyê, Eyşanê ji Xelîl re dest bigirim.

Dema dayika Xelîl ji Kêrman Beg re vê gotinê dibêje, Kêrman Beg hêrs dibe û dibêje: "Rabe ji mala min derê, êtimê nava mala min iro radibe qîza min dixwaze". Dayika Xelîl jê re dibêje: "Kêrman Beg hey hewar, hey meder, tu çîma wiha dikî, te di biçüktiya wan de soz dabû, der û cîran tev dizanîn ku Eyşan pêşgirtlema Xelîl e." Pişti van gotinan, Kêrman Beg radibe berî Xelîl û dayika wî dide û ji mala xwe derdixe. Carek din dibêje "Ez çardara Eyşanê nadim ser milê Xelîl, ezê çawa Eyşanê bidim Xelîl." Xelîl, tevlî dayika xwe bi dilekî bi kul radibin ji mala Kêrman Begî derdikevin û têbajêr. Xelîl ji xwe re xaniyekî digire û ew û dayika xwe di xanî de bi cih dabin. Xelîl di bajêr de ji xwe re karekî dibîne û dest bi xebatê dike. Her roj radibe berê xwe dide sükê, diçe dixebe. Ger nanek be ger du nan be, êvarê hildide tê malê û dide dayika xwe pê xwedî dike. Dibe êvar Xelîl Eyşanê difikire, dibe sibe Eyşanê difikire, di zarokatiya xwe de bi hev re geriyane, bi hev re keniyane, bi hev re birçî mane, tih mane, tevlihev razane tev têne bîra Xelîl. Xelîl diçe bajêr dibê Eyşan, diçe çolê dibê Eyşan, diçe avê dibê Eyşan, bi şevê dibê Eyşan, bi rojê dibê Eyşan.

Eyşan tu car ji bîra Xelîl dernayê. Rojekê Xelîl radibe hespekî ji xwe re dikire û li hespê xwe siwar dibe sibe û êwar karê seyr û nêçire. Kijan tê xwezgîniyê Eyşanê, Xelîl rêya wî dibire û dibêje Eyşan destgiritya min e tu kes nikare Eysanê ji xwe re bixwaze. Xelîl xortekî pir jîr û çeleng e, di nav bajarê Amedê de ji heft saliyan heya heftê saliyan herkes Xelîl nas dike û herkes pir jê hes dike. Lê Xelîl xortekî bê mal û xizan e.

Di wê demê de di navbera ereb û kurdan de şerekî pir mezin dest pê dike. Ereb roj bi roj zora kurdan dabin û leşkerên Ereban bajarê kurdan dixin bin desten xwe. Serok û wezîrê kurdan li hev kom dabin û dibêjîn divê em çareyekê ji xwe re bibînin. An jî wê ereb bajarê me tev bixin bin desten xwe û wê me qir bikin. Serok û wezîrê kurdan ferman didin ku çiqas mîrxas cengawer hene wan kom bikin bila li hemberî ereban şer bikin. Wezîrek derdikeve hizûra paşa û jê re dibêje mirovekî pir

Xelîlê Ciwan e, tu kerem bike were malê rûnê, Xelîl çûye sükê wê lezekî din were." Wezîr derbasî hundur dibe û rûdinin. Dayika pîr ji wan re qehwîyekê çedike, hîn qehwe li ber wan e, Xelîl ji derî dikeve hundur, merhebatîyê dide mîvanen xwe û li bejn û bala mîvanan dînihêre tev bi rûtbe ne. Xelîlê Ciwan dibêje "Mîrê min li qisûra min nenihêre, ez bala xwe didim bejn û bala we, rutbeyen we mîna wezîr û paşa ne, ez mirovekî xizan im, gelo we xêr e hûn hatine mîvanen min, hûn çîma neçûne

re dibêje ger ez Eyşanê ji te re bixwazim tê werî şer? Xelîl ji dibêje; "Belê, hema bila gustila min bikeve destê Eyşanê besi min e." Wezîr dibêje; Apê te kî ye? Xelîl ji wezîr re dibêje; "Apê min Kêrman Beg e, waliyê Amedê ew bi xwe ye." Wezîr radibe Xelîl hildide, berê xwe dide mala Kêrman Beg. Dema li deriyê mala Kêrman Beg dike, Kêrman Beg derî vedike. Dema çavê Kêrman Beg bi wezîr dikeve ji tîrsa lêva wî diqelişê û xwîn jê dîniqute û dibêje gelo min ci xete kir ku wezîr hatîye, gelo wê min ji wezîfê hilde an jî wê min bixeniqne. Wezîr dibêje "Walî netirse ez hatime xwezgîniyê, qîza te bixwazim ji Xelîl bîraziyê te re" Walî dibêje: "Ez Eyşanê bi qurbana Xelîl dikim, içar qey tu hatî heya mala min ez çawa Eyşanê nadim bîraziyê xwe yê Xelîl, ew bîraziyê min e, qey ezê Eyşanê bidim yekî ji wî çetir, heya niha Xelîl nehatibû dowa Eyşanê nekiribû." Wezîr digire, gustilê dixe tiliya Eyşanê, ji Xelîl re nîşanî dike û derdikeve dike. Paşê wezîr ji Xelîl re dibêje: "Va ez diçim tu jî li pey min were şer." Xelîl dibêje: "Belê, ezê werim şer, êdî ez bîmirim jî xema min nîne." Xelîl radibe dike, Eyşanê dibîne û xatirê xwe jê dixwaze û dibêje Eyşanê "Va ez diçim şer, dayika min teslimî te, ez heya bizivir tu yê dayika min xwedî bikî." Xelîl radibe berê xwe dide cem paşê û diçe. Xelîl dema derdikeve hizûra paşa, paşa jî qeflek leşker dide emrê Xelîl û berê Xelîl dide şer. Xelîl berê xwe dide şer, pêde pêde dikeve Hemîsê, Kehayê Kerûk û Kerbelayê heya ku tê derdikeve Musul û Bexdayê. Heft salan di nava şer de dimîne, di nava heft salan de fetha heft bajaran dike. Xelîl ji bo ku xem û kesera Eyşanê tim û tim di dilê wî de ye û ji bo ku rojekê zûtirîn bigîhêje Eyşanê li çol û beyaran tim birçî dimîne bi şev û rojan xewa wî nayê. Ji kerban derdek li bedena wî peyda dibe. Pişti ku dizivire cem paşa, paşa xelata wî didî û jê re dibêje lawê min ji cem min neçê, ezê qîza xwe bidim te, te jî bixim serleskerê xwe. Te ev şerê hanê qezenc kiriye, ev heqê te ye:

Xelîl dibêje: "Paşayê min ez ji xeynî Têlî Eyşanê bi tu qîzê re nazewicim û serleskerî jî ji min re lazim nî ne." û xatirê xwe ji pasê dixwaze û dikeve serê rê û bi rî dikeve, tê li ser kanya Xeznegolê. Li wê derê nexweşîya wî pir giran dibe, Xelîl ji hevalên xwe re dibêje êdî xêra min tune e, ez êdî nikarim werim, hûn bidin rî biçin. Ezê teze bi vî halê hanê çawa werim cem Têlî Eyşanê. Hûn herin, dema ku Têlî Eyşanê hat cem we pirsa min ji we kir hûnê bêjîn Xelîl di ser de şehîd ketiye, belkî ew jî min ji bir bike û ji xwe re mîrekî din bice. Hevalên wî li ber kanya ji Xelîl re holiyekê çedîkin û hundurê holikê tije pûş û qîş dîkin, heçî nanê ku bi wan re heye datînin cem Xelîl û kupê avê tije dîkin datînin cem. Bi ser de di girin û xatirê xwe ji Xelîl dixwazin bi dilekî kul dikevin rî tê. (Wê bidome)



*"Kuştin di bingeha xwe de hezkirin e"*

# Levhalar

"Lixwevegerin, lixwepirsin, xwenasîn...". Ev têgîn bi gurbûna Şerê Azadiyê re bi şeweyekî hûrbînitir bûn mijara gotûbêjên kurdistaniyan. Bi gişî di nivîs û gotaran de an di nava neynûkê de têr nivîsin an jî têr boldkirin. Hüseyin Kaytan jî di pirtûka xwe ya dawîn de bi şêweweyekî cihêring ev têgîn "bold" kirine. Pirtûka dawîn a Kaytan, ku bi navê "Lehvalar (Lewheyî)\*" e, gihişt ber destê xwendevanan. Ev pirtûka ku ji helbesten Kaytan pêk tê, ji layê Weşanxaneya Aram ve hate weşandin. Çapa yekem a pirtûkê, di sala 1997'an de li Almanyâyê ji aliye Weşanxaneya Mezopotamya-yê hate belavkirin. Ev pirtûk, duymîn pirtûka Hüseyin Kaytan e. Berî vê pirtûkê, bi navê "Ölüm Üçler Kadın ve Erkeğî" pirtûkeke Kaytan hatibû weşandin.

Pirtûk, di warê şewaza ristinê de awarte ye. Mirov dema pirtûkê dixwîne zêde lê nasekine. Her çiqas "Lehvalar" pirtûkeke helbestan e jî, li gelek waran dirûva serpêhatî û kurteçirokan lê dikive. Kaytan, hem pala xwe daye tiştîn rojane, hem jî pala xwe daye hêmanên mîtolojik. Carina ji mirov wertê, ew li çirokekê "binê zemana" guhdarî dike lê peyre ev tîna mîtolojik bi rîwî dibe, mirov yekser xwe li ser çiyayê Kurdistanê û li kolanên Stenbolê dibîne. Mirov ji lîwanên binê zemana, digihêje refîn ge-

rîyan. Ligel gerîlayê birîndar li dijî berf û bahozê li ber xwe dide. Li çiroka Yadê Naima, ku bi destê xwe dibîne, guhdarî dike. Piştre diçe li Eminönü ma-siyan dixwe.

Wekî li jor jî hate diyarkirin, di nave-roka "Lehvalar" de, temaya rabirdû û lixwevegerinê berbiçav e. Jî ber ku Kaytan bi xwe ji Dêrsimê ye, ev yek bi şêweweyekî şarezatir hatiye honandin. Jixwe di helbesten Kaytan de hêmaya Dêrsimê di nav hêmâyên sereke de cih digire. Helbestvan girîngî û pêwîstiya lixwevegerin û lê kolandina raboriyê wiha ristîye:

*"...Ru bû, raboriya ku em çeper kiri-bûn..."*

*"Em ku ve herin jî, li pey me ye rabo-ri..."*

Her wiha Kaytan ji bo têgihiştina rewşa iro, pêzanîna dîrok û raboriyê tîne rastê. Ev yek di lewheya yekemîn de wiha hatiye raberkirin:

*"...vê demê*

*"zîndan e jiyana rastîn ku dîlê xwe ye raborî asê kiriye di nava xwe de ka te bi ku ve biçi?"*

Li aliye din Kaytan li ser rewşa dawî jî hêvîdar e û guherîna dawî wiha berpês dike:

*"...Bi leza berikê pêk tê, ew daxwaza asê mabû li raboriyê*

*...Li me vedigere her tiştê ku me ji dest dabû*

*ci tiştê ku nediguherî guherî..."*

Her çiqas bo hemû nivîskar û hel-bestnîsan bingeha afirîneriyê zaro-kañ jî, lê tesîra zarokatiyê di helbesten Hüseyin Kaytan de geleki bikêr û diyar e. Xuya ye Kaytanî pirsa zarokatiya xwe dike. Bo nimûne, xaniyêñ axîn, salebend (taşlı yollar), tifîk û bi-xêrîk, cirayêñ xaniyêñ li quntara ci-yê.... Bi taybeti xaniyêñ axîn di hel-besten Kaytan de hêmayeke giringe:

*"Xweşik in xaniyêñ axîn*

*lé li ku! Li Kurdistanê"*

Jî ber vê hindê helbesten Hüseyin Kaytan her çiqas bi tirkî hatibin ristin jî bi têra xwe kurdewarî ne.

Digel her tiştî hemû temayan, temaya şehîd di helbesten Kaytan de ci-hekî taybet digire. Kaytan rîzân li ser şehîdan geleki têkûz ristine:

*"Wê te bibîne!"*

*Rûyê bêsi yê iro*


*cardin berê xwe dide Rojhilat*

*mîna demjîmîreke rojê,*

*ku dîvle demê, her şehîdîn me nîşan dide"*

Li layê din wateya ku Kaytan li "mirinê" bar kiriye, hêjayî diyar kirine ye. Bi baweriya Kaytan, mirin ne xatirxwestin e û di bingeha xwe de kuştin û hezkirin heman tişt e:

*"...Divê mirov fêri nan xwarinê, şe-rab vexwarinê û nemaze mirinê bibe... Hay jê hebe! Di navbera hezkirin û kuştînê de têkîli li dar e. Anglo kuştin û hezkirin di rastiya xwe de heman tiştin."*



Her wiha di beşa bi navê "Zehirli (Jehrîn)" de lénérîna helbestvan a li ser mirinê bêhtir zelal dibe:

*"Dema mir mirov, ne weki xatirxwestinê, divê weki ku digihêje hev bimire"*


Di pirtûkê helbestvan wateyeke taybet li "hingulîska şînkevir" bar kiriye. Yen ku dixwazin "hingulîska şînkevir" peyda bikin û bi dest bixin, bila ji wê pirtûkê bêpar nemînin.

MAZLÜM EŞREF

\*Ji ber ku di kurmancî de pevv dema xwerû bin, nabin pirjimêr, me ji zaravayê kirdki sude wergirt û me li beramberi "Lehvalar" "Lewheyî" bi kar-anî.

## "Kes bi dada me nepirsit, gille û dadê ci kit"

CELALETTİN YÖYLER



Dema ku mirov reng, rewş û dîmenêñ hovîtiyê, li Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê DGM ya Enqereyê tîne ber çavêñ xwe, mirov dixwaze, bi hezaran caran tifûyê li bavê împeryalîzma cîhanê bibarîne. Gelo çima împeryalîzma cîhanê? Lewre her ew e ku heftê û pênc salin ji bona berjew-endiyêñ xwe yên bi gemar ji dagirkeren welatê me re, piştgirî kiriye û em bi wan dide perçqandin. Ev dîtin û ramanêñ hanê, ku em derdibin, realîteyêñ heftê û pênc salan in, ku li welatê me û Rojhilata Navîn têne meşandin.

Ma qey Amerika û dewletên Ewrûpayê, nizanîn ku dagirkeren welatê me, heta niha bi hezaran kesen bêçek, kal, pîr û zarok li Dêrsimê, Zîlanê, Sasûnê, Helebçeyê û li cur bi cur dev-erên Rojhilat û Rojava û Bakur û Başûr, bi girsetî kuştine û jehr kirine. Hem jî

qey împeryalîzma nizane ku Dewleta nijadperest, bi rîexistinê xwe yên kon-trayî, hetanî iro bi hezaran karmend, rewşenbîr, nivîskar û rojnamevanê kurd kuştine. Hem jî wekî kurdan bi sedan zanyarêñ wekî İsmail Beşikçi, Haluk Gerger û Eşber Yağmurdereli ji ber ramanêñ wan ên hemdemî û mirovahî, avêtine zîndanan.

Dema ku mirov van dîmenêñ hovane yên li Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê ya Enqereyê, ku li hemberî rewşenbîrê mezin û parêzvanê mafêñ mirovan Akin Birdal hatine kirin, dibîne, gemariya împeryalîzma cîhanê dikeve bîra mirov. Lewre împeryalîzma ji dagirkeren pirtir tawanbar û súcdar e. Bi tundî, divê kesen ku xwe şoreşger û welatperêz dibînin, bi dadgeh û bi dadgeren rejîmê nexapin. Lewre kontra û DGM hevrê ne. Ji ber wê qasê çete di hundirê dadgehê de, tu paxavê ne ji dadgeran, ne jî ji kesî din dikin û dadgehê bi serê xwe de tînine xwarê. Ji ber van bûyerên ku her dem li ser herkesê xwenas û şoreşger diqewimin, divê ew ci bikin û çawa tevbigerin? Pir pêwîst e ku kesen şoreşger li dijî rejîma kontrayî, bi hev bigrin û bi dadgeriya rejîmê nexapin. Çawa ku Seydayê mezin

Mele Ehmedê Cizîrî bi rewşeke elestîkî û watedarî, di dîwana xwe de ev rewşa iro wiha anîye ser zîmîn :

*Kes bi dada me nepirsit, gille û dadê ci kit?*

*Te nebit dadî resek, beyhûde firyadî ci kit?*

Bi kurtasî Seyda dixwaze wiha bibêje: Dema ku kesekî li gîlî û şikayetê me bipirse nebe, tu yê gîlî û şikayeta ci bikî. Dema ku ji bo te dadger nebe, qêrîn û zarîna te bêkêr e. Yanî divê em xwe nexapînîn bi dadgeriya rejîma ku dijminê hemû çînêñ bindest û hejar e. Lî divê em bi yekîtiyeke xurt, bikevine nava tekoşîna li dijî vê rejîma bêdad, nîjadperest û xwînmij. Kesêñ şoreşger li dijî dek û dolabêñ rejîmê, divê hişyar û amade bin! Lewre di binê stûna asîmanê de, wekî vê rejîmê ne heye, ne jî tê dîtin. Ev heftê û çend salin, armanca vê rejîmê her tunekirin û windakirina gelê me ye. Pir mixabin doza gelê me çiqas bi pêş ve diçe jî, ev rejîm her li ser riya helandin û tunekirina vî gelîye. Ev jî mînakin ji tevgerên wan ên barbar û nemirovane ne, ku hêj naxwazin ku heyina vî gelî bipejirînin.

# Bira bira ye, bazar ji hev xuya ye

**L**i bajarê Nîsêbînê bi navê Eliyê Hecî Kermo mirovek hebû. Mirovekî zehf dewlemed bû. Li beriya Nîsêbînê zeviyê wî yên bejî û avî hebûn. Rojekê ew bang li karkerekî dike û dibêje:

– Kuro tu feqîr û, karê neh, deh rojan li baxçeyê min heye. Were ji xwe re lê bisixule.

– Ser çavan Apê Elî. Tu qenciyekê bi min diki. Ji te gelek razî me.

– Niha tu pere bi min re nîn e; divê di vî karî de tu pere ji min nexwazî. Belas bisixulî.

– Na Apê Elî na. Miftî belas. (Feqîro li benda qenciyek wî bû.)

– Sibehan tu yê taştiyê xwe li malê bikî û nîvro jî firavîna te li ser te ye.

– Belê Apê Elî.

– Evarê jî tu diçî malê û şîva xwe li-wir dixwî.

– Temam Apê Elî. Min ev şert û merçen te qebul kirin. Ez ji te gelek memnûn im. A niha ez ê dest bi karê xwe bikim.

Dema Eliyê Hecî diçe malê jê jina wî dipirse:

– Te û karker we çawa li hev kir?

Eliyê Hecî peymana xwe û karker bi kîf û devlikan ji jina xwe re şirove dike. Anglo feneke mezîn li yê karker kiriye. Dibe pite pita jînikê bi ser Elî ve dibêje:

– Tim û daîm tu di bazaran de qels, sivik û sist û. Ev bûye sed carî ku min ji te re gotiye di bazaran de jîr û jêhatî be. Vaye dîsa fen li te hatiye.

– Keçê, fena ci li min hatiye?

– Diviya ku te henekî din

– Keçê ma ez çilo bikim; wele dilê min pê şewiti.

## Bihuşt sê tebeqe ye

Rojekê sê zilam, yekî file, yekî cihû, yekî jî misilman têc cem hev û qala bi-



jî li ber xwe bida.

– Wekî ci? min dikaribû ci bikira?

– Kuro bira bira ye bazar ji hev xuya ye. Te henekî din li ber xwe bidaya, xwe giran bikira, te karibû şîva me ya êvarê jî bixista stûyê wî.

huşt û qiyametê dikin. Yê file got: "Bihuşt sê qat e. Ya binî ji misilmanan re ye, ya navîn ji cihûyan re ye, ya jor jî wê file bikevinê."

Mêrikê misilman zivirî û got: "Ma mala babê we ye, hûn dê tebeqeya binî

bidin misilmanan?"

File û cihû bûn yet û gotin: "Wele bîvê nevê ew e û hûn me aciz bikin, em wê jî nadîn we."

Yê misilman tenê got: "Baş e, hûn dê di ku re herin qata jor?"

Wan jî got: "Em mecbur in di qata we re herin jor." Yê misilman got: "Ger hûn ji bavê xwe neherin."

Berhevkar: İ. OMERİ

## Boqlî Peynîr

Qeymekamê Navçeya Goyan diçe mala muxtarê gundekî. Dema firavînê tê, muxtar tirkî baş nizane û dibêje: "Ka em firavînê bixwin." Pîreka wî firavînê tîne ber wan. Muxter ji pîreka xwe re dibêje: "Hela xanim 'boqlî Peynîr' getir qeymecem bege!"

Qeymeqam ji muxtar re dibêje: "Tu ci dibêjî muxtar?"

Muxtar dibêje: "Hele dur qeymeqam beg, bîz boqlî peynîr vardir, çok güzel-dîr." Pîreka wî, peynîrê bi boqê pîvazan têkilkirî, tîne ber wan. Qeymeqam mîze dike penêrekî spî ye. Ew tiştê ku ketiye mîjîyê wî ne wisa ye. Hêdî piçek tem dike, mîze dike tama wî pir xweş e. Ji muxtar re dibêje: "Valla muxtar boklu peynîrînîz çok hoş."

SEYDO GOYAN

## BI XELAT...

Birsel Gelecek Dîvâne	Peyva Vêşari	S	Tîn Şerîfde	Xerîf Vêşarî	B	Ş	Süçdar
G E T	I N A	B A	A Y	A Y			
Kerbedde	L A P E	E C	N				
Perdam	A Z A	P I R					
Sipînevî	I M Z A	A S U R I					
Hesîpî	E Y	A L	C				
Sed nîl Sembola	E S R	L E B					
H	A	G O L E					
Perde	E M I R	P a g t e k	B L				
A M I N	B A B I						

### Bersiva Xaçepirsa 130'î

Xaçepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de çi bersiv bigîhîjin destê me, em dê wan binixmîn û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 132'yan Kaseta Bahremo "Govenda Nusaybinê 1" ye.

#### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxdan, divê hûn "Peyva Vêşarı" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivisîn û tevî navîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesen ku xelata hejmara 130'yan Pîrtûka Selim 'Yusif û Zuleyha' qezenc kirine: Şirin Sönük/Êlih, Devrim B. Baran/Amed, Hangül Özbel/Amed, Reşit Sönmez/Mêrsin, İsmail Bakay/Semsur



## XACEPIRSA BI XELAT (132)

Straneke Seyidxan Kesê di wêne de	Süçdar Pêşgirek	.... Sîna Kesê bê av	Asiman Tipek	Jir, blaqlî Baneşane k	Xerabe
			1		
Kurin (Zayîn) Dema borî	3			... Liza	
				Küçük	
	Herdü tipên dawîn ên 'mehrî 'ê	Pêxember ek Ajanseke Tirkîyê		6	Vexwarina sereke Rojek
Zêdan Beri sîbê			Bere Kesê nemir		Tipek
	5			Pêlavahespan Ezing	2
Gîhanek	Tipa pêşin Dîni	Genimê herandi	Qertafek		
4	Herêmeke Kurdistan ê Xweli			7	
Sembola serxwe bûnê Keser		Xw eşik Bedew		8	
		Tipa pişti 'P' yê	Dengdêra 'Gur'	9	

PEYVA VEŞARI

1 2 3 4 5 6 7 8 9



# VENGÜVAZÊN KE HAMEY SANSÜRKERDIN

# Şores destê xortana vera serkewtin şino

**H**asan Akdag 1'ê pûşpera 1998 de Hannoverê Almanya, Hepsé Akerdeyê Lingen de qandê şermezarkerdina zordariya şerê taybetê tirkân û polîfikaya Almanya ya penaberan ser xo veşnabi, seba vîranînê ey, Festivalê Çand û Sporê ê Mazlum Doğanî bi hezaran xortî amey pêser.

Festivalê Mazlum Doğan ê çand û sporî yewîn par Leuven de viraziya bi, ê diyin jî di Etten-Leur, bajare Hollanda de rojî îne dest pê kerd. Festivalo ke, bi seyan werzişkaranê (sporkar) kurdî tewr bî û nezdîyê des hezârî kurdî ardî verê yewbînî, bi rak-erdina adirê festivali û bi antena alê ERNK dest pê kerd.

Nameyê komîta festivali ser, Ahmet Gülenî qisey kerd û wina vat: "Kurdê ke ewro sîrgûn de yê, di festîvale de wayîr rê netewey û ercayîyinê xo veciyay, bi no haway politikayê Almanya yê penaberan sero û şero ke dewleta tirk kurdan sero ramena ci rê bi cewab."

Înan rê 70 cenî, 745 sporkarê kurd tewrê festivali bî û 18 beşan de weçînayîno verîn (ön eleme) viraziya. Di pêroyê Ewrûpa de 24 komê futbolî tewrî bî û miyane girotin (gûres), karate, kîck boks, tekvando û boks de weçînayîno verîn viraziya.

Di peyniyê maraton de (vazdayîn dûr û derg) Erdal Demir yewîn, Ali Duman didiyin, Hüseyin Ersöz jî hîrêyîn veciya. Di kîck boks de Cenan Binay yewîn, Oruç Gördük didiyin, Erol Özkar hîrêyîn veciya. Di 100



metre vazdayînê cenîyan de Ümit Akdeniz yewîn, Hanım Yalnız didiyin Ayşe Altışık jî hîrêyîn vecîyê. Di 400 metre vazdayînê cenîyan de Ümit Akdeniz reyna yewîn, Hanım Yıldız didiyin û Halide Akdeniz jî hîrêyîn vecîyê.

Di sporanê Rojhelata Dûrî de xortê kurdan 15 deqey kîfî temaşekaran ard. Tekvando de İbrahim Îm yewîn û didiyin jî Emrah Görmez veciya. Bi hezaran kurdan bi kîfweşîna temaş kerd.


Roj didiyin de, Festivalê 2'yin ê Mazlum Doğanî ê Ciwanan bi vatenê Nuri Dersimî dest pê kerd; Alvoz Roje, Koma Teatra Ehmedê Xanî, Koma Muzîka Berfina Besta, Ozan Eylem, Ozan Xelil Xemgîn û Gerîla

Yusif konser da.

Nûnerê Yewîna Ciwananê Kurdistanî (YCK) Xortê ke Ewropa de weşîna (jiyanê) xo ramenê zey "Şahînê Mezopotamya" bi name kerdî. Yewîna Azadiya Cenîyanê Kurdistanî (YAJK) û Xortê Şoresger ê Alternatifî (Devrimci Alternatif Gençlik) jî mesaj rişî festival.

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan jî raya telefoniya tewrê festivali bi û vînayînê xo yê xortan ser wina ardi ziwan. Öcalanî mesaja xo de xortê kurdî zey motorê şoreşî nişan day û wina vat: "Xortî, hem bingehê mergî, hem jî bingehê vejînê (diriliş), coka bingehê xilasî yê (reyayînê) jî. Ek qezenc bibo, heme çî bi xortan qezenc beno. Şoresge kurdan xortan da

dest pê kerdin û imana jî oyo serkewo." Öcalanî da zanayin ke vist seriyo oyo teverê welatî de maneno, la belê teverê welatî de manayin kesi girêdayini welatî ra dûrî nêfîneno. Serokê PKK qiseyê xo wina dewam kerd: "Ezo vist seri yo teverê welatî de xo kena temam, û min welat mezg û zereyê xo de viraşto û no viraştin qe yew wext ji nîno vinîkerdin û bi şexsiyete azadî çiqas dûrî bê jî, mardim her wext şêno xo hemverê çiyê xîrab bisewiknê (bipawo)." Öcalanî veyn da xortanê Ewropa û da zanayin ke karê ïnan tenya xo şeri ré hedrekerdin niyo û di karêdo zanîstî, çandî û viraştina jûbiyi-na kurdan de hetkarîn û rîberî jî karê ïnan ê. Abdullah Öcalan wast ke xorti bi girêdaney şehîdana karê xo bikerê. Serokê PKK Öcalanî artêşekê xortan sero jî vindert û ana vat: "Xo baş raverberdin jî bi qasî şerê koyan muhîm o. Gere şima ana hîra bewnê, girêdayîbiyayina bi şehîdan jî na wa. Mekewê miyanê çiyê xirabî, eger şima bikewê çiyanê winayan miyan, şima kewnê duşteverê vîranînê Hasan Akdagî. Madem nameyê nê festivali nameyê Hasan Akdagî nawo ro, gerek şima nêkewê miyanê qe sucêke, hele hele karê tilyak (uyuşturucu); ma tilyag kerdo qedexe, şima jî nêkewê miyanê nê karî. Ene faqey neyarî ya. Bi hezaran xortan ewca kenê pûçî. Ez wazena vacî nika ra pey ez şima dir a. Ez reynan vana ez xo nêkena extiyar. No nişan dano ke ez girêdayîyê şima wa. Ma xort dest kerd pêkerd, mago xort biqedênen. Rayê bînî çiniyo."



**HÜSEYİN DENİZ**

Birayê min ê hîja û delal nîvîskar û rojnamevanê kurd, Hüseyin Deniz, di 9'ê gelawêja sala 1992'yan de li Serêkaniyê bi destê kontrayan hate qetikkirin.

Ew bi serbîlindî kete nav karwanê şehîdîn çapemeniya azad. Birayê min Hüseyin şehîdî azadiyê ye.

Em di heftaliya şehîdbûna te de bi hurmet te û hemû şehîdîn Welat bi bîr tînin. Em te ji bîr nakin, tu her dem di dilê me de dijî.


**LI SER NAVÊ MALBATA WÎ XWÎSKA WÎ EDLA DENIZ**

*Silav be ji rojêna ronahî re  
Ên bi das û çakûç dimeşîyan,  
Silav be ji ên ku ji bo gel mirine re.  
Ê çek di dest de ketiye erdê  
Hezar silav ji wan re,  
Ji jiyana wan a birûmet re.*

Hevalê Hüsnü li Almanyayê li bajarê Hannoverê tevi hevalekî xwe ket nav karwanê şehîdan.

Em li ser şessê Hevalê Hüsnü li ber bîranîna şehîdîn azadiyê bi rîz serê xwe ditewînin.

**Li ser navê welatparêzên Cizîra Botan SACÎDE Û JIYAN**



**HÜSNÜ İMRET**  
1973–27.07.1998

# Bi serokê NÇM'ya Mêrsînê Servet Özkan re hevpeyvîn Dî şer de pêşî çand tê binpêkirin

Xebat li ser çand û hunera kurdî ye. Lî mixabin axaftina me bi zimanekî biyanî ye. Pêwîst e mirov li kampanyaya rojnameya Azadiya Welat xwedî derkeve "bi zimanê xwe bixwîne, binivîse û bifikire."

Birêz Servet, NÇM gi çax li Mêrsînê vebü û dest bi xebatê kir.

O NÇM berî niha du salan, 26 tîrmeh'ê de vebû. Vebûna NÇM yê jî pêwîstîyek bû, çanda gelê kurd û gelên Mezopotamya yê di bin zilm û zorê de ye. Çanda me tê pisavtin. Armanca me jî ew e ku em li çand û hûnera xwe xwedî derkevin û bi pêşve bibin. Xebata me li ber hemû astengiyan jî berxwedan e.

Ji roja ku NÇM vebûyê heta iro çend kom hatine avakirin û perwerdahiya we çawa didome?

O Ji vebûnê heta iro di warê mûzik, folklor û şanoyê de xebat tên kîrin. Di mûzikê de bi navê Koma Welatê Rojê, Koma Vendidad û Koma Hemdem sê kom hatine avakirin. Di foklorê de "Govenda Şoreşê," di şanoyê de "Teatra Arzeba" xebatê xwe didomînin. Li aliyê din jî ji bo besa wêneyan xebat tên kîrin.

Dema behsa NÇM ê dibe şaxa Stenbol tê bîra mirov bi rastî gelek xebatê wan ên giranbuha hene. Bi her awayî xwe bi gel daye pêjîrandin. Em dikarin vî tişî jî bo we jî bibêjin?

O Ji vebûnê heta iro gel germahîyeke mezin nişan da li hemberî hemû astengiyan jî gel bi paş ve gav navêjê. Bi zanatî li saziyên xwe xwedî dardikeve. Hêjî em nikarin bibêjin em bersiva van daxwazan didin, ev xwedî derketin jî xebata me xurtir dike. Ji bo vê divê em xebatê xwe baş bikin.

Her wekî hûn pê dîzanîn, şerekî qirêj li welat tê meşandin û vê gavê hûn jî ji welatê xwe dûr in, li vî welatê biyan hûn bi hunereke çawa dixwazin bersivê bidin vî serê qirêj?

O Hêzên mêtînger di vî şerî de pêşî dixwazin çanda gel ji holê rakin, bi vî awayî jî şerî xwe divê bi ser bixe. Di şer de pêşî çand tê binpêkirin, lewra çand, hebûna gel e, bingeha wî ye. Her gel bi çanda xwe tê naskirin. Dema mirov ji erdîngariya xwe dûr dikeve, li metropolan dijî her tişî ji mirov re biyan dibe, lewre ji zimanê xwe, ji çanda xwe dûr dikeve. Gel di merheleyeke wisa de bû, ji xwe, ji zimanê xwe û çanda xwe şerm dikir. Lî iro bi têkoşînê re gelê me édi xwedî li van nirxan derdikeye. Jê re bûye rûmeteke mezin. Dema mezinê me yên 60-70 sali têne vir, bi zimanê xwe dipeyivin, li muzikê guhdar dikin, xwe li gundê xwe dihesibinin.

Mezopotamya xwedî çandeke dewlewend e. Lî mixabin ev çanda dewlewend, tevî gelê kurd hatiye tarûmarkirin. Hûnê karîbin, bi ci awayî li vê çandê xwedî derkevin û wê derxînin ser rûyê avê?

O Wê pêşaroj nişan bide. Armanca me di xebatê me de ev e. Gelê kurd gelekî

qedîme, li nîrxên xwe heta iro xwedî derketiye. Kurd di van hêlan de bi saziyên xwe nû ne, ev jî bi destpêka têkoşînê ve girêdayî ye. Dîroka gelê kurd bi dîroka têkoşîna azadiyî ve girêdayî ye. Li ber hemû zilm û zora mêtîngeran gelê kurd ne zimanê xwe ji bîr kiriye ne jî çanda xwe, ev jî ji ber erdnîgariya wî ye. Pêwîst e mirov bikeve nava her hêla jiyana kurd. Hemû nîrxên tarûmarkîfî divê em bidin jiyandin, ev jî armanca me ye hem bidin jiyandin û hem jî bi pêş ve bibin, xurt bikin.

Dema em li saziyên kurdan dinérin, hemû kesén di van saziyan de dixebitin kurdin lî mixabin bi zimanekî biyan diaxivin. Bi taybetî jî hin kes qaşo dibêjin ez li ser çanda kurdî li ser zimanê kurdî dixebitim lî di jiyana xwe ya rojane de bi zimanê xwe naaxivin ev ne xwe xapandin e gelo?

O Belê bi sedan sal e zimanê me qedexekirîfî ye. Ev bersiv xwerexnekirin e jî. Xebat li ser çand û hunera kurdî ye. Lî mixabin axaftina me bi zimanekî biyanî ye. Bi rastî jî li hemû saziyên me yên çandî biryara axaftina bi zimanê kurdî hatîbû standin. Qedexekirina li ser zimanê me sedema vê qasê, mirov baş nikarin xwe bi kurdî ifade bikin ev jî dibe sedem ku bi zimanê xwe, naxwîne û nanivîse. Dema mirov van neke, nikare bipeyive jî, pêwîst e mirov li kampanyaya rojnameya Azadiya Welat xwedî derkeve "bi zimanê xwe bixwîne, binivîse û bifikire." Divê mirov di her hêla jiyânê de bi zimanê xwe bipeyive û vê kîmasya mezin ji holê rake.

Hin kes hene dibêjin em hunermend in û radihêjin tembûra xwe berê xwe didin Ewrûpayê hûn van kesan çawa dinirxînin û jî bo wan bangek we heye?

O Ev rev e. Li welat şerek heye, di vî şerî de jî bersiva berjewandyên wan nayê dayîn, tîrs heye ev jî dibe sedem. Lî dema mirov van bîbêje pêwîst e mirov rastiyekî bîne ber çav, li welat derfetên xebatê bi kurdî tune ne, lê li hêla din jî hin kes bazîgariya vî karî dikin, ji ber vê jî li derfetên firesh digerin, loma jî welatên Ewrûpayê li xweşê wan diçê. Iro saziyên wekî NÇM'ê derfetên vê xebatê derxistine. Dikarin xebatê bikin lê dîsa jî mirovên berjewendiyên wî li pêsiya têkoşîna gelê wî ye, dûr dikeve, direve. Banga min ji wan re ew e ku xebatê


xwe di saziyên xwe de bikin. Iro bi têkoşîneke dijwar ev derfet hatiye çêkirin, bi xwîna şehîdan ev sazi hatiye avakirin, divê mirov li ser van nîrxên bi rûmet bazîganiyê neke. Ev jî suçekî pir mezin e. Yênu ku hûneren wan hene û dixwazin ji bo gelê xwe kar bikin, bila di saziyên xwe de vî karî bikin.

Astengî an jî pêkutiyê dewlewendî li ser we hene.

O Digel ew qas astengî jî dîsa em xebat xwe bi pêş ve di bin. Ne gengaz e ku em gavan bi paş de bavêjin. Di her qada hûneren de em bi kel û ahd dixebitin. Em vê piştigîriyê, vê hêzê jî ji gelê xwe distînî.

Hûn bi giranî li ser kîjan beşa hûnerî dixebitin.

O Em tu cudahîyê naxine nav şaxen hûnerî, her gulyî hûnerî ji bo me giranbuha



Servet Özkan ji bo hunermendê revok bang kir û got: "Divê li ser nîrxên gelê kurd bazîganiyê nekin. Divê hunera xwe di saziyên xwe de bixebitînî."

O Di destpêka vebûnê de pir astengî çebûn pêşî xwestin xebata me bibînin, ka digîhîn armanca xwe an na, piştî saleke din astengiyan xwe nişan dan, ev jî ji ber xwedî derketina gel e. Di 27'ê adara 97'an de nêzîki 30 kesî hatin binçavkirin. Di nav wan de zarokên 5 salî û kalên 80 salî jî hebûn. Naxwazin ziman ûçanda kurdan pêş de here, mirov bi çanda xwe bîn perwerdekirin.

Ev jî dibe sedem van astengiyan. Di 2'ê sermawezê de Teatra Jiyana Nû hatîbû vir, wê demê şanoger ji ser sehneyê anîn xwarê, tevî min 13 heval girtin. Nêzî 400 kes kişandin kamerayê, navnîşanên wan hatin standin. Dû re ez û ji şanogeran Kemal Ulusoy 40 rojî di girtîgehê de man. Iro tenê ji bo salona çalakiyan 3 doz hatine vekirin. Armanca wan a yekem ev e ku me di warê aborî de biqedînîn, ji ber vê yekê hêwana (salona) me ya ku me çalakî tê de pêk dianîn mohr kirin. Hîna jî girtî ye. Her wekî hûn pê dîzanîn şaxê NÇM'ya Amedê jî hatiye girtin a Ruhayê vebû venebû, ew jî girtin. Gelek caran ji avêtin ser şaxa Stenbolê.

Digel ew qas astengî û pêkutiyê dewlewendî, hûn xebata xwe çawa bi pêş ve dibin.

ye. Lî gelê me niha şano nas nekiriye. Dema berê gelê me bi çavekî ne baş li şanoyê dinérî teyê bigota qey di riyeke ne qenc de ye, bi wî awayî dinirxand. Lî vê gavê şanoya kurd hêdî xwe bi gel dide naskirin. Heta niha gel hema xwe dabû ser muzik û folklorê, ez bawer dikim em û qada şanoyê de jî xwe bi gel bidin pejirandin.

*Belê banga we ya dawî ci ye?*

O Banga min ji ronakbîrîn me re ev e; hin kes hene, dibêjin em welatperêz in bi rasî berdîl jî dane lî mixabin iro li saziyên xwe xwedî dernakevin. Dema mirov dihere mala wan, zarokên wan zimanê xwe yê zikmakî ji bîr kirine, ev jî rûresî ye. Çand û ziman rûmata gelin. Pêwîst e mirov li çanda xwe li zimanê xwe xwedî derkeve iro rojnameyeke wekî Azadiya Welat tê weşandin heftê carekê pêwîst e ev rojname bi deh hezeran bê firotin. Pêwîst e mirov li van nirxan xwedî derkeve, bila tu kes ji bîra neke ku rûmeta me bi derketina van nirxan ve girêdayî ye.

FATİH BENDEWAR/ MÊRSİN